

BERBANG

ORGANA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ


١٣

سالا
عوّل

دو بیان

ROJNAMEGERIYA KURDI

مترجمہ درج
دکٹ ایونہ سلی
مرونڈر
دانہ دھوپی
جانا کوکنے بلور



و مکنن فوج هه
دولتین مظن چه
ی جما حکات
به آف جربده با
ن . از هینی در کم
و کی نو چه دین
یدی آزی دست

کونی به م اسلام
نی طرف خدیده
فتح بشا وان
ن و عظ و نسینا
ر کوئی بین دناسن
فتح بشا وان

گرمهان فی ترمیم و تعمیره بین خود جو تم و معرف هم این سپی این درب این سی سه بند مکونی و به

مد هزار شکل
خلق کون و ظالینا
علم آدیتا علم و معرفت
هین دنیا پایده چقا
تجاده مکتب و ما
جهه نایه جریده در
زگشت فونما زیده
خونه ده راست و قو
نه خونه ه زدن
چاره وی چه کم
جریده ه شنبه
روزه حربه که زد

BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd
Berpîrsyar:
 Hanefi Celeplî
Redaktorê sereke:
 Mueyed Teyib
Redaksiyon:
 Ahmet Cantekîn, Bavê Nazê,
 Xebat Arif, Zinarê Xamo.
Pergela rûpelan û rêzkirin:
 Ahmed Cantekîn.

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Ansvarig utgivare:
 Hanefi Celepli
Chefredaktör:
 Mueyed Teyib
Redaktion:
 Ahmet Cantekîn, Bavê Nazê
 Xebat Arif, Zinarê Xamo.
Layout och sättning:
 Ahmet Cantekîn.

Navnisan / Adress:
 BOX 45205
 104 30 Stockholm

Navnîşana seredanê / Besöksadress:
 Hornsgatan 80, 1tr. Stockholm.

Telefon:
 08/68 60 60

Postgiro:
 Kurdiska Riksförbundet
 64 38 80 - 8

Abonetî / Prenumerationer:
 Kes / Enskilda 100 Skr./sal-år
 Meqam / Myndigheter 200 Skr./sal-år

İlan / Annons:
 Qapaxa paşî / Baksida 2000 Skr.
 Rûpelên navîn / Insidor 1000 Skr.
 Nîvrûpel / Halva sidan 500 Skr.

ISSN - 0281 - 5699

Sal: 5 Hejmar: 3/86 (35) 23.6.1986

NAVEROK

Berbang û 88 Saliya Rojnemegeriya Kurdi.....	3
Mueyed Teyib	
Kongra Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd	
A Şeşa Pêkhat	4
A. Ferman	
Kongra 6-em û Merhaleke Nû	5-7
Hanefi Celepli	
Pirsa Kurdi Dîsa Di Parlamentoya Swêdda.....	8
Berbang	
Li Tirkîyê: Kijan Demokrat û Demokrasî.....	9
A. Tigris	
Emerîka Çima Êrîşî Libya Kir?	10
Qeddaflî Bi Serxwebûna Kurdistanê re ye.....	10
Dest Di Destde Em Derkevin 1-Gulanê.....	11
Gera Xwendevanên Kurd Li Sovyetistanê.....	12-13
Ahmet Cantekîn	
Me Şairê Mezin Hêmin Bi Bîranî.....	14
Cunta Faşîst Li Tirkîyê Hate Protesto Kirin.....	14
Civîna VPK Li Ser Kurda Li Bajarê Enkopîngê.....	15
Şeva Piştgiriya Jinê Kurdistanê.....	15
Dibistanên Şemiyê Hatin Girtin.....	16
Smînerek Li Ser Dîroka Rojnamegeriya Kurdi.....	17
Zinarê Xamo	
Weşanên Nû	18
Bûka Kurda	19
Bedirxan Sindî	
Bilûra Sihîf.....	20-21
Sergey Korîpanov	
Rûnkirdinewey Şew (helbest).....	22
Pêşgotin	23
Wergê: Bavê Nazê	
Redaksiyon	

Bergê Pêşin:

Rojnama "Kurdistan" û hîmdarê wê M. M. Bedirxan

Bergê Paşin:

Jineke Kurd

Wênekêş: J. Kurdo

Xwendevanêن hêja,

Ev hejmara "Berbang"ê ya yekeme piştî kongra şeşem a Federasyonê. Weke hûn bixwe jî dizanin, ev hejmar dereng ma. Hoyen derengbûna wê jî ew bûn, ku helbijartina redaksiyonek nû wext girt, her wesa nebûna ciyê Federasyonê û derbasbûna çap-kirina "Berbang"ê bo sistemek nûtir.

Em daxwaza lêborînê ji we dikin û êdî "Berbang" dê di dema xwe da derkeve.

REDAKSIYON

BERBANG Û 88 SALIYA ROJNAMEGERIYA KURDÎ

Mueyed Teyib

Her kesekê dîroka gelê kurd nas bike, bi tiştekî xerîb nizane, ku rojnamegeriya kurdî, rojnamegeriyek mişext (muhacir) bû ye, ango ne li ser axa Kurdistanê serê xwe hildaye. Evca dema mirov dizane rojnamegeriya gelekî ne li ser axa wî şîn bû ye, wê demê mirov baş dizane ku ew kar çiqas sext û dijwar bû ye û ew kesên bi wî karî rabûne, çiqas hêja û dilsozêن gel û zimanê xwe bû ne.

Di 22.4.1898-an de, Mîqdat Methet Bedirxan, li bajarê Qahîrê rojnameya "Kurdistan" derxist. Bi derketina wê, "Kurdistan" bû yekemîn rojname bi zimanê kurdî derdikeve û M. M. Bedirxan bû yekemîn rojnamevanê kurd û pêşewayê kerwanê rojnamegeriya kurdî.

Roja 22-ê Nisanê, rojeke geşe di dîroka gelê kurd de. Di vê rojê de bû, cara pêşîn zimanê kurdî kete meydana pexşan û rojnamegeriyê. Rojnamegeriya kurdî rolekî mezin îştiye û dilize di hişyarkirina gel û riswakirina kolonyalist û rîjîmîn regesperistên Kurdistan di nav xwe de parvekirin. Her ji destpêka xwe û heyâ û rîbi doza gelê xwe re bû ye û demokrat û pêşverû bû ye di naveroka xwe de. Her çende hinde cara dijminêne me karîne hinde rojname û kovara di bercewendiya (meslehet) xwe de bi karbînin, lê rûpelên wan rojname û kovaran jî vala nebûne ji nivîsar, çîrok û helbestên bi doza gelê kurd ve gîredayî û pir caran nivîkarên kurd ketine zîndanan, ji ber nivîsîn xwe yên di wan rojname û kovaran de hatine weşandin.

Îsal temenê rojnamegeriya kurdî derbasî 88 salan dibe. Weheye (mimkîne) 88 sal demekî kurt be hember temenê rojnamegeriya gelên pêşkeftî, lê di dîroka gelê kurd de van 88 salan cihekî gelek bilind û fireh standiye û gelê me şanaziyê pêdike. Di van 88 salan de beşekî pir mezin ji edebiyata me yê klasik û folklorên me belav bû ye û ji wendabûnê hatiya parastin. Bi sedan nivîkarên mezin perwerde bû ne û ji vê giringtir alfabyek ji zimanê me re hatiye dîtin û zimanê edebiyê kurdî pêşde çû ye.

Ev 88 sal in rojname û kovarên kurdî derdikevin. Dema mirov li van 88 salan dinêre, gîftariyek herî mezin tête ber çavên mirovî, ji detstpêka temenê rojnamegeriya kurdî destpêdike û heyâ û rîbi didomîne, ew ji eve ku temenê piraniya rojname û kovarên kurdî kurt bû ye û di temenê xwe yê kurt ji de gelek caran rawestane yan ji bi şêweyekî rîk û pêk derneketine, eve ji vedigerîte hoyê (sedem) siyasi bi pileya (derece) yekemîn û hoyê aborî û civakî bi pileya duemîn.

Kovara "Berbang" bi xwe ji di vê gîftariyê de dijî û hîn nikariye xwe ji vê nexweşiyê rizgar bike.

Di sala 1981-an de komelên kurd li Swêdê Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd damezirandin. Federasyonê pêwîst dît ku kovarekê derxe, ev kovar bibe dengê Federasyonê û mil bi milê kovarê kurdî xebatê ji ziman û edebiyata kurdî re bike.

Li Hezîrana 1982-an kovara "Berbang" derket. Bi hemû kêm û kasiyên xwe ve karî heyâ û weşana xwe bidomîne, ev bi tenê bi baweriya min serkeftin e û cihê rîz û dilxwaşıya piraniya xwendevanêne me ye, lê ev nayê wê manayê ku "Berbang" bi rengê xwe kariye xwendevanêne razî bike û "Berbang" dê wilo bimîne. Em dixwazin "Berbang" ê pêşde bibin û ji bo pêşvebirina wê gelek rexne û pêşniyar ketine destê me. Em wan pêşneyaran rast dibînin û bi cîhkîrina wan her çend sext be jî lê pêwîste.

"Berbang" li Swêdê derdikeve. Ûro hejmara kurdan ji 8 hezaran derbas bû ye, ji wan gelek ronakbîr û nivîskarin. Her wesa "Berbang" kovareke gehîştiye piraniya welatên Ewropayî yên kurd lê dijîn, hinde hejmarêne wê gehîştine Îranê û Suriye û vê dawiyê daxwazek gehîşte destê me ji welatek Efrîkayî "Berbang" ê dixwaze. Êdi kovarek zemîna weşana wê bi vê ferehbûnê be, divê kovarek pêşkefti be û bi dilê xwendevanêne xwe be.

Di Nîsanâ 1986-an de Kongirê 6-an yên Federasyonê pêk hat. Divê Kongirê de komîteyek nû hate helbijartin, her wesa redaksiyonek nû jî pêk hat. Redaksiyona me di civîna xwe ya pêşîn de gelek pêşniyar ji bo pêşvebirina "Berbang" ê pêwîst dîtin. Ji wan:

- "Berbang" bi her du alfaban (latînî û erebî) derkeve.
- "Berbang" xwe ji çewtiyê ziman û dektîlo rizgar bike.
- "Berbang" di salê de 12 hejmar derkeve û di demekê berçav de.
- "Berbang" bi zûtirîn wext bigehîte destê xwendevanêne xwe.

-"Berbang" xwendevanêne xwe bi rewşa gelê me li her çar besen Kurdistanê û penahêndên (multecî) kurd li derveyî Kurdistanê aghdar bike.

-"Benbang" bi xwendevanêne xwe nivîsar û kitêbên biyanî li ser gelê kurd bide naskirin.

-"Berbang" zanyariyê (informasyon) li ser weşanêne kurdî bide xwendevanêne xwe.

-"Berbang" girîngiyê bide pirsên jin û zarokên kurd.

-"Berbang" zemîna weşana xwe firehtir bike, ku bigehîte Kurdistanê û her welatekê kurd lê hebin. Eve û gelek tiştên din.

KONGRA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD A 6-A PÊK HAT

A. Ferman

Di 4 û 5-ê Nîsana 1986-an de, Kongra Federasyonê ya 6-a civîya. Kongre, bi saxitiya nuneran û bi bîranîna şehîdên Kurdistanê destpêkir. Di pêre, helbijartina dîwanê pêkhat û kongrê xebata xwe berdewam kir.

Di vê kongrê de divabû sistêma Federasyonê bihata guhartin. Wek têt zanîn, di kongra îstîsnayî ya federasyonê de, 15-16-ê Hezîrana 1985-a, bîryarek hatibû standin, ku êdi Federasyon wê sistêma xwe ya kevn biguhêre û sistemek nûh pêk bîne. Ev sistêma nûh wê wisa pêk bihata: "Her belediyak ku kurd tê de hene, wê komelak li wir bihata damezrandin. Di wê komelê de hemû kurdên welat-parêz, demokrat û pêşverû dikarin bibin endam". Ji bo vî karî kongrê komîsyonek helbijart. Komîsyonê kar û barê xwe xelaskir, li gor bîryara kongra îstîsnayî wê di meha Sibatta 1986-an de kongre biciviya. Komîta Kargêr di 1.3.1986-a de Kongre gazî civînê kir. Lê sed mixabin di wê şevê de serokwezîrê Swêd, serokê Partiya Karkerê Sosyal Demokrat, Olof Palme hate kuştin. Ji ber vê bûyerê, Komîta Kargêr û nunerên kongrê bîryar dan ku kongre mehekî bi şünde bixînin.

Gor bîryara kongra îstîsnayî ya Federasyonê, gerek kongre bi nûnerên kongra îstîsnayî vebiba û pişti xwendina rapor (ya xebatê û malî) û ruspîkirina Komîta Kargêr wê nûnerên kevn cihê xwe bidana nûnerên komelê, ku li gora sistêma belediyan hatine damezrandin. Û di kongrê de wisa jî bû.

Pişti ku dîwana kongrê hate helbijartin, raporê organan hate xwen-

din. Di pêyî xwendina raporan re me hevî dikir, ku munaqeşe li ser rewşa kurdan û rola Fedrasyonê bîba. Lê mixabin wisa çênebû. Li şûna pirsên giring, pirsên geleki gengaz hatin munaqeşe kirin.

Komîta Kargêr, di pêyî xwendina raporan û munaqeşen li ser raporan bi piraniya dengan hate rûspîkirin. (Rapora xebatê di hejmara "Berbang"ê ya 10/85-de hatibû weşandin)

Pişti ruspîkirina organan, Komîsyona Koordinê insiyativa kongrê stand û navê nûnerên komelê, ku li gora sistêma belediya hatibû damezrandin (49 nûner), xwend. Nûnerên nûh, cihê nûnerên kevn gitin û kongre bi vî avayî karê xwe domkir.

Bi dîwana kevn karê kongrê hatibû ser benda muneqesekirina destûra Federasyonê ya nûh, ku ji aliye Komîsyona Koordinê de hatibû hazirkirin. Destûr bi guhertinên pir hindik hate qebûlkirin.

Di pêyî qebûlkirina destûra Federasyonê, dor hate ser xalê helbijartina organen Federasyonê. Hilbijartina Komîta Kargêr demek dûr û dirêj kişand. Di seeta dawî de serokê dîwanê pêşneyar kir, ku "kifše ne bi lîstan, ne jî bi awakî din, Komîta Kargêr nayê helbijartin. Divê ji bo Komîta Kargêr, heval xwe bi xwe pêşneyar bikin". Li ser vê pêşneyara serokê dîwanê, heft hevalan xwe ji bo Komîta Kargêr, sê hevalan jî ji bo cigirê Komîta Kargêr xwe pêşneyar kirin. Hevalan ku xwe pêşneyar kirin, bi piraniya dengan hatin helbijartin. Pişti helbijartina Komîta Kargêr, Komîta Çavdêr (sê esil û cîgirek) hate

helbijartin. Bi vî avayî kongre hate xala dawî, ya daxwazî û pêşneyaran. Ev pêşneyerên jêrin ji bo Komîta Kargêr hatin kirin.

1- Organa Federasyonê, "Berbang" divê bi du elfaban (latînî û erebî) bête weşandin.(Biryar)

2- Ji bo mafê weşandina bi zimanê kurdî di radyo û televîzyona Swêd de, kampanyek ûmze bête vekirin.

3- Divê Federasyon pêşraxistinekî (sergî) amade bike û tiştên kurdî bide naskirin.

4- Kampanyek aborî, ji bo aboriya "Berbang"ê xurt bibe, divê destpê-bike.

5- Ji bo kurdan, divê Federasyon kur-sên cure-cur amade bike.

6- Festivaleke kurdî bê amedekirin.

Di pê van daxaz û pêşneyaran, hevalek li ser navê Komîta Kargêr a nûh ji dîwanê, nûneran û mîvanan re spasi pêşkêşkir û diyarkir ku Komîta Kargêr wê bi hemû hêzê xwe di karê Federasyonê de bêşdar be.

Bi vî avayî dawiya kongrê hat. Erê rast e, dawiya kongrê bi vî avayî hat, lê bi rastî wazîfîn pir giring li pêşîya Komîta Kargêr sekinîne. Ji bo ku Komîta Kargêr karibe van wazîfîn giring pêk bîne, bê guman alîkariya komelêndam rolekî mezin dilize. Em di wê baweriyê da ne, ku Komîta Kargêr û komelêndam, wazîfîn ku li ser milêñ wanin wê bi dilsozî bi cî bînin. Ji ber ku başiya kar û barê Federasyonê, rûspîtiya kurdên li Swêdêne. Ji bo vê yekê, divê em giş milan bidin hev û karê Federasyonê bi awakî kolektîvî bibin serî. Ji bo federasyoneke hîn bi hêztir ber bi pêş! Bijî Federasyona Komelêndam Kurdistanê Li Swêd!

KONGRA 6-EM Û MERHALEKE NÛ

Hanefî Celeplî

Di 5 û 6-ê Nisana 1986-ade, kongra Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd a 6-em pêk hat. Di vê kongrêde, Federasyon ji avayiya xweyê berê derbasî avayiyekê nû, "avayiya bele-diyan" bû. Bi vê yekê, kongra Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd a 6-em, bû merhaleke nû di şerê azadiya neteweyê kurdde. Riya yekîtiya hêzên kurd ên welatparêz, demokrat û pêşverû, di warê neteweyî û demokratikde vebû. Hêviya me eve, ku ev merhale bi kar û barê xweve pêşdetir biçe.

Avayiya Federasyonê ya berê çawabû? Avayiya nû, "avayiya bele-diyan" çawaye? Bêgoman xwendavanê "Berbang"ê wê van pirsan ji me bikin. Lewra jî divê em di vê nivîsarede li ser van pirsan bisekinin. Herweha divê em behs bikin, wekî kurd kengî hatine Swêd, karê wanê rêxistini çawa destpêkiriye û hatiye ci merhalê.

KURD KENGÎ HATINE SWÊD?

Kurdên ku iro li Swêd dijîn, -jimara wan gora texmînan 8 hezarîn- di destpêka salên 60-ide hatin Swêd. Grûba kurdên ku hatine Swêd, ji kurdên herçar perçen kurdistanê û ji kurdên ku di dema serhildanande ji Kurdistanê hatine surgunkirin (kurdên navça Anadoliyê, kurdên Lubnanê, kurdên feylî) pêktên. Hatina kurdan Swêd ji ber sedemên cure-cureye û rastî demên cure-cure tê. Sedemê hatina kurdan Swêd, em dikarin di sê xalande kom bikin:

- Ji ber sedemên aborî. Piraniya van kurdan ji navça Anadoliyêne.

2. Ji bo xwendinê. Ev grûbeke piçûke û ji herçar perçen Kurdistanê hatine.

3. Ji ber sedemên siyasi. Ev grûba mezine û piraniya wan ji perçen Kurdistanê ên di bin destê Tirkîye û Iraqêde hatine. Di salên dawîde grûbek jî, ji perçê Kurdistanê yê di bin destê Iranêde hatine.

Demên cure-cure ku kurd hatine Swêd jî, em dikarin di çar demande kom bikin:

1. Destpêka salên 60-î. Kurdên ku di vê demêde hatine, ji navça Anadoliyêne û ji ber pirsên aborî hatine Swêd.

2. Destpêka salên 70-î. Di sala 1971-êde, li Tirkîye, cunteke leşkerî dest danî ser karîna welêt û êrîşen giran birin ser welatparêzen kurd. Ji ber vê yekê gelek kurd derketin devayê welêt. Grûbek ji wan jî hatin Swêd.

Herweha di van salande grûbek xwendekarêñ kurd jî hatin Swêd. Henek ji wan, li welatêñ sosyalist xwendina xwe qedandibûn û nedikarîn vegeerin welêt. Ev grûba, ji herçar perçen Kurdistanê bûn.

3. Nivî salên 70-î. Pişî ku şoreşa kurd li Başûrê Kurdistanê şikest, grûbeke mezin ji vî perçî tevî malbatêñ xweve hatin Swêd.

4. Dawiya salên 70-î. Di sala 1978-ade, li Tirkîye hukmê leşkerî hate ilan kirin. 11 bajarêñ Kurdistanâ Bakur, ketin bin hukmê leşkerî. Leşkerî tirk êrîşen giran birin ser kurdan. Di sala 1979-ade ji leşkerî Iranê êrîş bire ser Kurdistanâ Rohelat. Di sala 1980-ide, şerê di navbera Iran û Iraqêde destpêkir. Herwisa di vê salede cunteke leşkerî li Tirkîye dest danî ser karîna welêt. Ev bûyerên ha bûn sedemê derketina gelek kurdan dervî welêt. Ji dawiya salên 70-î û bi virde

nêzîkî 4000 kurd hatin Swêd û hê jî têñ.

KOMELÊN KURDÎ LI SWÊD

Cara yekem li Swêd, Komîta Swêdî-Kurdî bi ïnîsyatîva çend swêdiyên dilsoz û kurdekî welatparêz, Dr. Sele-haddîn Rastgeldî, sazbû. 60 rêxistinê swêdî di vê Komîtêde endambûn. Komîta Swêdî-Kurdî xebatêñ granbiha ji bo kurdan kiriye. Gelek derman şandine Şoreşa Kurd li Kurdistanâ Başur. Pirsâ kurdî birine platformên navnetewî. Xebata Komîte di sala 1970-ide, paşî peymana 11- Adarê sekiniye.

Di dawiya salên 60-î û destpêka salên 70-ide, xwendekarêñ kurd li Swêd, liqê Komela Xwendkarêñ Kurd li Ewropa damezrandin. Endamên vî liqê di destpêkêde kêm bûn. Di nîvî salên 70-ide, endamên liqê zêdebûn û gelek xebatêñ berbiçav dikirin. Lê çawa tê zanîn, di sala 1975-ade Şoreşa Kurd li Kurdistanâ Başur şikest. Vê bûyerê têsirä xwe li ser Komela Xwendkarêñ Kurd Li Ewropa jî kir. Komele bû du perçe, herweha liqê Komelâ li Swêd jî bû du perçe û xebatêñ wê sist bûn.

Herweha di van salande rêxistina Bahoz jî li Swêd kar dikir. Karê vê rêxistinê bêtir bi dizî dibû û ji sala 1976-a şûnde tu xebat bi navê vê rêxistinê çenebû.

Di dawiya sala 1976-ade, Komela Karkerêñ Kurd Li Swêd, li Stockholmê sazbû. Piraniya endamên Komele karkerêñ kurd bûn. Yekemcar kurd li Swêd bi saya vê Komelê bûne xwedî lokalekê. Di despêka sala

»

1977-ade, di kongra Komelê ya îstîsnaide, grûbek ji komelê veqetiya û Komela Çanda Kurdi Li Swêd saz kirin. Herweha di vê salêde Komela Çanda Kurdi Li Huddinge (belediyeke Stokholmê) jî sazbû. Di navberê salên 1978 û 1979-ande çend komeleñ kurd ên din hatin damezrandin: Komela Piştgirî û Çanda Kurdi, Komela Çanda Karkerêñ Kurdistan, Komela Demokratik a Çanda Kurdi û yên mayîn. Heta sala 1980-î, nêzîkî 20 komelêñ kurd li Swêd saz bûn.

Divê em li vir diyar bikin wekî sedemê sazbûna ewqas komelan, ne ji ber ku kurdêñ li Swêd hewcîyê ewqas komelan bûn. Sedem ev bû, wekî ew kesen ku di dîtineke siyasîde bûn, dihatin cem hev û komelek saz-dikirin. Ji xwe gava meriv destûrêñ van komelana bide ber hevdû, tu fer-qî nabîne. Hemû wek hevin. Îro li Swêd ji 30-î bêtir komik û komele hene. Piraniya wan jî li Stokholmêne.

FEDERASYONEKE KURDÎ PÊWÎSTE

Li Swêd gelek grûbêñ biyanî hene. Piraniya wan xwedî federasyonin. Federasyonê biyanî, li hember merciyên resmî mafêñ grûbêñ xwe diparêzin û di pirsên çandî û civakîde alî-kariya wan dikin.

Grûba kurd li Swêd, heta sala 1980-î ne xwediye Fedeasyonêkê bû. Lê ew daxwaz him ji kurdan, him ji ji merciyên Swêd dihate kirin. Pirsên kurdan di civata Swêdde, hebûna federasyoneke kurdi pêvîst dikir.

Di dawiya sala 1980-îde, çar komeleñ kurd: Komela Karkerêñ Kurdistan li Swêd, Komela Demokratik a Çanda Kurdi, Komela Çanda Karke-reñ Kurdistan û Komela Piştgirî û Çanda Kurdi, hatin cem hevdû û damezrandina federasyoneke kurdi ders kirin. Dûre komîtek ava kirin ji bo damezrandina federasyoneke kurdi.

Komîta Damezrandina Federasyoneke Kurdi, çend mehan kar û barê xwe meşand û kongrek civand. Di kongrêde hemû xalêñ rojevê qediyân û dor hatibû xala hilbijartina organan. Piştî ku serok hate hilbijartin, kesî xwe neda ber berpirsyariyê mayîn. Li dawî, kongra damezrandinê têkçû.

Lê hêviya kurdan neşkest. Komîta Damezrandina Federasyoneke Kurdi, careke din civiya û astengêñ heyî ders kirin. Di 25-ê Gulana 1981-ê de, Kongra Damezrandina Federasyoneke Kurdi ji nûve civiya. Vê gavê nunerêñ şes komelan di kongrêde amede bûn. Di vê kongrêde Federasyona Komelêñ Kurdistanê Li Swêd hate damezrandin. Bi vî avayî, cara yekem bû, ku li dervayî Kurdistanê rîexistineke kurdi, kurdêñ herçar perçen Kurdistanê di bin baskêñ xwede civand. Bê goman ev gaveke mezin bû, merhaleke nû bû di şerê azadiya neteweyê kurdde.

XEBATA FEDE-RASYONÊ Û ASTENGÊN WÊ

Belê, bi sazbûna Federasyona Komelêñ Kurdistanê Li Swêd, kurdêñ li Swêd gaveke hêja pêşde avêtin. Lê bê şik ev gava hêja, ne bi hêsanî bû. Gelek astengêñ, ku di damezrandina Federasyonêde hebûn, di her kongreyê Federasyonêde xwe nişan didan. Berî ku em behsa astengêñ Federasyonê bikin, divê em çend karêñ hêja, ku Federasyon pê rabûye, diyar bikin.

Çawa Federasyon sazbû, merciyên Swêd ên resmî ta bi hukumeta Swêd guh dida Federasyonê. Di pirsên ku kurd elaqedardikirinde, dîtina Federasyonê dihate pirsîn. Gava Federasyonê daxwazek dikir, ew daxwaz pir caran nedibû dudu. Li ser daxwaza Federasyonê, di Zanîngeha Mamostande li Stokholmê, beşê kurdi vebû. (Xwendekarêñ vî beşê, di 6-ê Heziranê 1986-ade xwendina xwe teman kirin û diplômên xwe standin.)

Di dawiya danûstandina bi Dafrâ Perwerdekirinê, gelek imkanêñ bas ji bo zarokêñ kurd bi dest ket. Federasyonê heta îro kovara "Berbang" û -tevî ku kêmasyîn wê gelek bûn jî bi zimanê kurdi weşand.

Bê şik Federasyonê dikarî bêtir kar bike. Lê astengêñ di rîexistiniya Federasyonê rî nedida. Çawa me di destpêka vê nivîsarêde behs kir, her komeleke kurdi, nêzîkî dîtineke siyasî bû. Wek tê zanîn, eniyek di nav rîexistinê kurdi yên siyasîde tune. Her çiqas hebûna eniyekê daxwaza me hemûyan be jî, mixabin rastiya me

eve. Heta di nav hin rîexistinê mede dijîfî jî heye. Ev rewşa ne bi dilê me, têşîra xwe di nav rîexistinê demokratikde jî nîşan dide.

Di kongrê Federasyonêde, pir caran komelêñ endamê Federasyonê dixwastin, ku giringiya wan di Federasyonêde hebe. Ji bo vê armancê ji çend komelêñ li ser kaxez hatin damezrandin. Di her kongreyê Federasyonêde, dijîtiya dîtinêni siyasî jî, bûne astengêñ mezin. Wekî, komela "A" razî nedibû ku komela "B" di organê Federasyonêde cî bigre. Komela "C" digot, "felan kes di Komîta Kargérde cî bigre, em tune-ne", komela "D" digo "felan kes cî negre, em tunene". Mixabin, astengêñ Federasyonê ev bûn.

Ji ber van astengêñ ha, Federasyon di herdu kongrê xweyê pêşinde bê serok ma. Yekî serokatiya yê din qebûl nedikir. Di kongra Federasyonê sîyemde (25.1.1983), serokê Federasyonê hate hilbijartin. Di vê kongrêde hejmarê komelêñ endamê Federasyonê gêhiştibûn 17-an.

Astengêñ Federasyonê heta kongra çarem bêtir bûn. Kongre di 17-ê Çiriya Paşîn 1983-ade civiya. Lê kongrê nikaribû astengêñ xwe hal bike. Lewra jî têxirî 4-5-ê Sibatê 1984-a bû. Di vê civînêde, her çiqas çend komele ji endametiya Federasyonê xwe kışandibin jî, Federasyon ji têkçûnê rizgar bû. Ji vê kongrê şûnde, sistbûneke berçav di xebata Federasyonêde xwe diyar kir.

Kongra Federasyonê ya pêncem divabû di 17-ê Çiriya Paşîn 1984-ade biciviya. Lê ji ber ku astengêñ heyî hal nebûbûn, piraniya nuneran nehatibûn kongrê û kongre "li gor destûrê" têxirî 26-27-ê Çileyê Paşîn 1985-a bû. Kongre di vê rojêde civiya, lê rewşa di kongrêde ji halkirina astengêñ heyî gelekî dûrbû. Di dawiyê kongrêde, nuneran biryar dan, wekî piştî çar mehan kongreke îstîsnaî bicive û heta wê çaxê divê nuner çareki ji astengêñ Federasyonêre bibînin.

Bégoman, rewşa Federasyonê bala her kurdeki welatparêz dikşand û ji bo Federasyoneke hîn bi hêztir muneqeşe dihate kirin. Piraniya kurdêñ li Swêd, doza guhartina sistêma Federasyonê dikirin. Wek altêrnatîv li ser modela "komelêñ belediyan" dihate sekinandin.

Di 7-9-ê Heziranê 1985-ade, kongra Federasyonê ya îstîsnaî civiya. Di

van herdu rojande, kongre xelas nebû û bi heftekî têxîr bû. Di civîna 15-16-ê Heziranêde kongrê dom kir. Rewşa Federasyonê bi heralî hate muneqeşê kirin. Piraniya nuneran dixwastin wekî Federasyon derbasî sistêma "komelên belediyan" be. Li ser vê daxwazê pêşniyarek jî hate kirin. Li ser pêşniyarek bi piraniya mezin biryar hate girtin. Ji bo bicîanîna vê biryarê jî komîsyoneke koordîne ji pênc kesan hate hilbijartin.

KAR Ü BARÊ KOMİSYONA KOORDİNE

Piştî kongra Federasyonê, Komîsyona Koordîne dest bi kar û barê xwe kir û li gor biryara kongrê programke xebatê hazir kir û da pêşiya xwe. Herweha Komîsyonê prênsibên komelên belediyan jî têspît kir:

—Divê di her belediyê ku kurd lê dijîn, komeleke kurdî bê sazkirin.

—Şexsek dikare tenê di komelekêde ku endamê Federasyonêye, bibe endam.

—Divê her komelek seksiyonekê ciwanan û seksiyonekê jinan saz bike. Ji bo pirsên din, divê komîten xebatê saz bibin.

—Her kesê ku destûr û armanca komelê qebûl dike, dikare bibe endamê komelê. Divê endamê komelê di çarçova prênsibên komelêde bixebeitin. Dervayî komelê, her endam di kar û barê xweyî siyâside serbestin.

Komîsyona Koordîne, piştî ku programa xwe ya xebatê hazir kir û prênsibên komelên belediyan hazir kir, dest bi civînan kir di belediyênu ku kurd lê dijîn. Di hemû civînen Komîsyonêde, kurdan diyar kirin wekî ev modela başe û ew hazır ku di modeleke ûsade kar bikin.

Li gor biryara kongra Federasyonê ya îstîsnaî, divabû Komîsyona Koordîne piştî çar mehan kar û barê xwe bi raporekî pêşkêşî Komîta Kargêr û Komîta Nuneran bikira. Herwisa bi raporêre, divabû Komîsyonê destûrên komela belediyan û Federasyonê ji hazır bikira. Komîta Kargêr û Komîta Nuneran jî wê biryar bidaña, wekî ka şertên ku avayıya Federasyonê bê guhartin hene yan na.

Di 9-ê Çiriya Paşîn 1985-ande,

Komîsyona Koordîne civînek bi Komîta Kargêr û Komîta Nuneranre pêkanî û rapora xwe tevî destûrên komelên belediyan û Federasyonê pêşkêşî civinê kir. Di civînêde, Komîta Kargêr û Komîta Nuneran biryar girtin, wekî şertên ku avayıya Federasyonê bê guhartin hene. Piştî civînê Komîsyona Koordîne dest bi xebata xweyê damezrandina komelên belediyan kir. Heta kongra federasyonê ya 6-em deh komelên belediyan hazır bûn. Di kongrêde ew deh komelên belediyan, cihê komelên endamên Federasyonê ên kevnare girtin. Bi vê avayıya Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd hate guhartin. Di xebata Federasyonêde merhaleke nû dest pêkir.

KAR Ü BARÊ LI PÊŞIYA FEDERASYONÊ

Wekî me li jor diyar kir, dora 8 hezar kurd li Swêd dijîn. Gava meriv ferqê sewiya civatên Kurdistanê û Swêd bide berçava, wê têbigêwekî astengen grûba kurda li Swed çine.

Berî her tiştê ev kurdê ku ji ber êrîşen dijmin derketiye dervî welêt û hatiye Swêd, hewcêyî alîkariyeke mezine. Gelek ji wana di êşkêncande derbas bûne, zar û zêçen xwe li welêt hîştine û ji wan bê agahdarin. Gava têن Swêd jî, demeke dirêj di kampê multeciyande derbas dikin û pir caran jî nizanin, ka ewê li Swêd bimînin ana. Divê Federasyon karibe destê xweyî alîkariyê dirêjî wan bike û mafê multeciyêndi kurd di çarçova prênsibên Komîsyona Yekîtiya Netewan A Mullteciyande biparêze.

Jinê kurd, ku piraniya wan nexwendîne û di bin cotzulmêdene, di civata Swêdde zehmetiyên mezin dikşin. Di warê peydakirina karekîde, xwedîkirina zarokên xwede, hînbûna zimanê swêdîde û di jiyana civakîde astengen mezin hene li pêşiya wan. Divê Federasyon karibe alîkariya jinê kurd bike, wekî ew karibin ji zulma ku li ser wane rizgar bibin û di tevgera rizgariya neteweyê kurdde cihê xwe bigrin. Herweha ji bo ku jiyana wan di civata Swêdde hêsanîr bibe, divê Federasyon ji bo wan imkana hazır bike.

Ciwanê kurd ku di civata Swêdde mezin dibin, hewcêyî alîkariyên mezinin. Divê bi alîkariya Federasyonê, ew bi pîrsa kurdî hîn bibin û bi ruhekî welatparêzî mezinbin. Zimanê xwe, çanda xwe ji bîrnekin. Bixwînin û fêde bîghînin mîletê xwe. Hînî tiştê xirab nebin.

Zarokên kurd, ku li Kurdistanê jiyana zarokiyê nasnakin, di salêñ pir piçûkde dest bi xebatê dikin, di dibistanê kolonyalîstante têñ asimîle kirin. Di civata Swêdde gelek îmkanen hêja hene, wekî zarokên kurd dikarin jê fêde bibînin. Ew dikarin bi zimanê xweyî zikmakî bixwînin û bi şexsiyeteke kurdîtî mezin bibin. Di wextêñ xweyê valade bilîzin û tama zarokiyâ xwe derxînin. Ji bo vê yekê jî divê Federasyon karê pêwîst ji bo zarokên kurd bike.

Li welatê me dijmin, zimanê me, çanda me, edebyata me, folklora me, bi kurtî her tiştê me qedexe kirine. Divê em di vê azadiya ku li welatê me tune, ziman, çand û edebyata xwe pêşde bibin û bi gelên cihanêre bidin naskirin.

Tevgera rizgariya neteweyê kurd hewcêyî piştigîrî û alîkariya bi her avayıye. Li Swêd 8 hezar kurd dijîn. Di nav wande gelek zana, ronakbîr û hunermend hene. Divê em karibin hêzên xwe bikin yek û piştigiriya tevgera rizgariya neteweyê kurd bikin. Divê em pîrsa kurd û Kurdistanê bi cihanê bidin naskirin û piştigiriya hêzên pêşverû û demoqrat bigrin. Ji rîxistinê navnetewî doza mafê neteweyê kurd bikin û li gel wan dijminen neteweyê kurd rusar bikin. Bi kurtî kar û barê ku li pêşiya me sekihiye, evin. Ji bo ku em karibin jî bin vî barî rabin, divê em dest bidin destê hev û bi hevre kar bikin. Daxwaza ku neteweyê kurd ji me dike, eve.

Navnîşana Federasyonê ya Seredanê:

Hornsg. 80, qat 1. Stockholm

Nivîsandinê:

BOX 45205

104 30 Stockholm

Telefon: 08/68 60 60

PIRSA KURDÎ DÎSA DI PARLAMENTOYA SWÊDDA

Ji sala 1979-a û virde, VPK(Partiya Çep - Komûnist), her sal di parlamentoya Swêddde li ser pirsa kurdî muneqê vedike. Heta iro, parlamentoya Swêd li ser pirsa kurdî birtyarek negirtiye. Lê her partiyê endamê parlamento, dîtinê xwe li ser pirsa kurdî diyar kirine. Bê istisna hemû partiyên ku di parlamento xebedî kursîne, qebûl dîkin wekî neteweyê kurd di bin êrîşen girandeye, Kurdistan di nav çar dewletande (Iraq, Iran, Tirkrye û Sûriye) perçê bûye.

Lê heta iro tu partiyê nexwestiye, ku hukumeta Swêd pirsa kurdî di platformên navnetewîde têxe rojevê. Ew hercar dibêjin, ku kurd ji alî rêxistinide perçekirine, tu rêxistinê kurdî, ku hemû kurdan têmsîl dike, tuneye. Lewra ji zehmete, ku mirov pirsa kurdî di platformên navnetewîde muneqêse bike. Heta carna ji dibêjin, "Eger em pirsa kurdî bibin platformên navnetewî, ev pirs wê zirâbîne".

PÊŞNIYARA VPK LI SER PIRSA KURDÎ

Piştî ku VPK sala çûyî pirsa kurda anî Parlamentoya Swêd, başbûnek di rewşa gelê kurd de çênebûye. Ji ber vê yekê, hemû ho hene ku em ji nu ve bixwazin wekî partî, hukumet û parlamentoya Swêdê bala xwe bidin pirsa kurdî û ji bo başkirina rewşa gelê kurd bixebitin.

Du aliyên vê pirsê hene. Yekemîn eve, ku mirov di warê navnetewîde ji bo piştgiriya tekoşîna gelê kurd ci dikare bike? Di vî warîde divê ew êrîşen giran, ku mafê mirovaniyê didin bin lingan, bêt protesto kirin. Duwemîn ji, divê em rewşa kurdên li Swêdê bibînin û tê bighê, ku ev koma hewcîyê alîkîriyên xase. Mirov nikare vê komê bi komên biyaniyên dinre rüber bike.

Ji bo pirsa yekemîn, divê hukumeta Swêdî însiyatîv bigre û di platformên navnetewîde vê pirsê bîne rojevê. Berê hate gotin, wekî ne mimkune ku mirov pirsa kurdî di organên Koma Netewande têxe rojevê. Heta hate gotin, ku ev yeka wê zirarê bighîne pirsa kurdî. Lê kurd bi xwe ne di vê baweriyêdene. Her çiqas yekîtiyek di navbera wande tunebe ji,

hemû partî û komên kurdî li ser vê pirsê li hev dîkin. Bi taybetî ji ew dixwazin, wekî komîsyona Koma Netewan a mafê mirovaniyê li ser pirsa kurdî bisekine.

Însiyatîveke din ji Swêd dikare di Konseya Ewropa de -li kêderê Tirkîye ji endame- bistîne. Li wir imkanen Swêd hene, wekî rewşa gelê kurd li Tirkîye muneqêse bike.

Gelek mirovîn kurd ji cî û warê xwe bûne û di rewşa multeciyandene. Li Îranê kampê multeciyen Kurd, yên ku ji Iraqê hatine derxistin, hene. Gelek ji wana bê nufusin. Swêd, divê karibe xizmetekî bide wan însanan. Di warê koma kurd li Swêd, em nikarin mesuliyetê ji ser xwe bavêjin. Di vê pirsêde, em bi tu ciyên dinre ne girêdayîne. Ji bo swêdiyan, derbarê rewşa kurdan a xasde agahdariyên pir, pêwîstîn. Bi taybetî ji di vê demêde, ku derxistina multeciyen kurdan ji Swêdê û tiştên din rewşa kurdan nebaş kiriye, divê hemû xebatkarên, ku bi pirsêni biyaniyan û multeciyare mijûl dîbin, bêne agahdar kirin. Divê di rewşa koma kurdan li Swêdêde başbûnek û baldayinek bêtir pêk

Di virde tiştê rastî tenê eve, wekî rêxistinê kurdî, ku neteweyê kurd li herçar perçen Kurdistanê têmsîl dike, iro tuneye. Ji xwe hêviya neteweyê kurd ji eve, ku rêxistinêkî ûsa pêkbê. Herweha em bawerin, ku rêxistinê me ji vê yekê dixwazin û ji bo wê kar ji dîkin.

Dema eniyeke ûsa fireh, demokratik û netewî pêkbê, wê gelek parlamento yê welatên cihanê pirsa kurdî muneqese bikin û ev pirs wê bibe pirseke rojîn di rojeva platformên navnetewîde. Ev yeka diyare, divê xebata me, me nêzîkê wê rojê bike.

VPK, wek hersal isal ji, di meha çileyê paşînde, pêşniyarek li ser pirsa kurdî pêşkêsi parlamento ya Swêd kir. Di pêşniyara xwede VPK, li ser pirsa kurdî dûr û dirêj dîsekine û di dawide bi pênc xalan cî dide daxwazên xwe. Em pêşniyara VPK bi kurtî û daxwazên wan hemûyan di virde pêşkêsi xwendevanen "Berbang" ê dîkin.

bê.

Lewra em dixwazin:

- Divê parlemento bîryar bide, ku hukumeta Swêd însiyatîv bistîne, ji bo ku pirsa kurdî di Komîsyona Koma Netewan a Mafê Mirovande têkeve rojevê.

- Divê parlemento bîryar bigre, ku hukumeta Swêd însiyatîv bistîne, ku rewşa gelê Kurd li Tirkîye, di Konseya Ewropade bikeve rojevê.

- Divê parlemento bîryar bigre, ku hukumet bixebite, wekî alîkîriyên mirovanî ji Swêd bîghê kurdên ku li kampê multeciyane.

- Divê parlemento bîryar bigre, ku hukumet bixebite ji bo sazkirina navçekerê çanda kurdî li Swêd.

- Divê parlemento bîryar bigre, ku hukumet bixebite ji bo rewşa kurdên li Swêd baştır bibe.

Stockholm, Çileya Paşîn

Lars Werner, Bertil Mobrînk, Jörn Svensson, Oswald Soderqvist, Nils Berntsson, Inga Lantz

LI TIRKIYÊ: KÎJAN DEMOKRAT Ú DEMOKRASÎ

A. Tigris

Kevneserokwezîr û lîderê sosyal demokratên Tirkiyê Bülent Ecevît, çend mehan berê di rojnama "Cumhuriyet"ê de, bi nivîsarên pêriyodîk serpêhatî û bîranînê xwe yên dema serokwezîtiya xwe (1978-1979), weşand. Ecevît, di van serpêhatî û bîranînê xwe da, behsa doza kurdan jî dike û di vê babetê de dîtin û tewrîn xwe yên wê demê û niha dide diyar kirin.

Di "Cumhuriyet" a 21.11.1985-an de Ecevît, li ser du stûnan nivîsarek bi navê "TEDBÎRÎN KU JI BO PARVEKARAN BÊN GIRTIN, DIVÊ GEL NÊZÎ WAN NEKE" nivîsand û belav kir. Wek her gavî, di vê nivîsarê de jî "parvekar", kurdîn welatparêz in. Di ciyekî nivîsarê de, rojnamevanekî tirk, di derbarê doza kurdan de pirseke weha ji Ecevît dike:

"Dibêjin we gotiye, ku divê mirov dewsa zor û zulmê, bi awakî mirovanî nêzikî mirovân Rohelat bibe û hin tiştan bi wan bide kirin, pirsa Rohelat di 'çarçova qanûnan' de bibîne. Dîtinê leşkeran bi awakî din bûye. Gelo ev rastin? Çiye pirsa Rohelat?"

Bersiva Bülent Ecevît weha ye:
"...Di derbarê Rohilat û Başûrê Tirkiyê de (qest Kurdistan - A.T.) dîtin û tewrê min ji dema sekreteriya min vezelal û berçav e."

Di sala 1967-an de, dema ku civînên bi navê "mîtingen Rohelat" dest-pêkirin, her çigas armanc ne parvekarî bû jî, lê dîsa parvekaran dixwas-tin wan mîting û meşan ji xwe re bi kar bînin. Min çawa ew rewşa ha dît, min dest ji civîna meclîsa partiyê berda û ez ji Stembolê çûm Rohelatê û Rohelata Başur. Li wir, min dest bi gereke dirêj kir, di civînen li meydanan û gewexanan de ez li dij parvekaran derketim.

... Ez bi xwebaweriyê û bi mînakên berçav dikarim bêjim, ku li Tirkiyê tu politîkavanekî qasî min vekîrî, dai-mî û bi bîryar li hember parvekaran nesekiniye"

Bulbulê "demokrasiya" Tirkiyê, Bülent Ecewîtê nijadperest, ev car divê babetêde ji ser serpêhatî û bîra-nînê xwe yên dîplomatîk mînakân rêz dike:

"Ne tenê di hundur de, li dervê welêt, di danûstandina bi derva re jî min ew tewir stand. Min dizanîbû, ku li İraqê parvekar, bizawa Barzanî ji Amerîka Yekbûyî alîkarî digrin. Min, di hev dîtinê xwe de bi Kisinger re û di dema muhlefeta partiyê me (CHP) de, gava ez çûm Amerîka, bi serok Ford re munaqesa vê pirsê kir. Min diyar kir, ku Emerîka, li Rohelata Navîn li dijî hin dewletan piştgiriya tevgera kurdî bike, li dawî zirare wê bîghê Tirkiyê jî. ...Min di her danis-tandinê xwe de, di vê babetêde bala Amerîka kişandiye. ...Ez niha li yad-daştan xwe dinêrim, di 7-ê Gulana 1979-an de, dema ku min û dewsgirê wezîrê derivekariyê Amerîka, Christofer, hevdû dît, wê demê jî, -demekî gelekî krîsik bû, cî û bahsa vê doza ha jî nebû- min mesela parvekaran dîsan vekir û ji bo ku ji parvekaran re alîkarî neye kirin, min ji Amerîka temînat xwastiye."

Di nivîsarê de Ecevît, bi zimanekî vekirî û bê şîrovekirî dide diyarkirin, ku di doz pirsa kurdan de, ji ordiya xwe cûdatir nafikire. Di vê babetêde ew û ordî hemfîkrin. Û bi rastî jî wiloye. Papaxanê demokrasiyê Bülent Ecevît, li ser henek kurtepirsan, di şeva 12-ê Îlona 1980-î de, telefonê serokatiya leşkeriya Tirkiyê dike û rewşê pirs dike. Generalek di telefônê de bersîva wî dide: "Ordiyê dest da ser karînê". Ecevît, pirsa dudyân ji general dike: "Ordi bi teví, an beşek jê?" General: "Ordi di nav hiyareriya xwe de, bi teví dest da ser karînê". Ecevît, telefonê bi hêdî datîne û "Baş e! ew çax tişt tune" dibêje.

Belê demokrat Ecevît(!), ji ordiya xwe ya demokrat û aştîxwaz(!) hew-qas bawere. Ecevît hewqas demokrat û antî faşiste, ku bû şes salin, li Tirkiyê ordiya wî ya faşist hîmê demok-

rasiya wî ji binî ve rakir. Bi hezaran mirov kuşt, girt û di êskencan de derbas kir. Kilit li deriyê partiya wî û li devê wî yê papaxan bi xwe xist. Lê wî wek demokratekî li dij cuntayê qet wazîfê xwe pêk ne anî. Yewnanîstan ne dûr e, di bin guhê Tirkiyê da ye. Hemûyan dît, demokratên Yewnanîstanê çawa cunta xwe xistin. Ger bîhna demokrasiyê di pozê Ecevît de hebûya û di rayên laşê wî de xwîna demokratiyê habûya, dê ji mîrxasiya Z. Alî Butto şerm bikira, ku serê xwe ji diktator Ziya Ul Hak re qet da ne anî. Di van şes salên dema faşizmî de Ecevît, sosyal demokratên tirk û rîexistinê li Tirkiyê li dij faşizmî devê xwe girtin û destên xwe dan ser hev.

Lê li derê welat, bi taybetî li Ewropa ci kirin? Ecevît di vê babetê de weha dinivîse:

"Ísal, di destpêka 1985-an de min li Hamburgê li hin bajaren Elmanya yên din û li Awistiryayê ders û konferans da. Di wan ders û konferansan de, carina ez rastê henek kesên ku piştgiriya parvekaran dikin, hatim. Li ser navên pirsan, ji min hînek pirs hatin kirin. Min li ber çavên gudarên xwe yên biyanî, li dij wan tewrê xwe da diyarkirin. Li Swêdê jî, li dij parvekaran min tewrê xwe, bi qanala televîzyon, radyo û rojnaman eşkere kir û li dij wan kampaniyeke mezîn û dijwar vekir".

Wek têt zanîn Bülent Ecevît, di şin û merasîma vesartina kevneserokwezîrê Swêdê Olof Palme de jî beşdar bû. Di pêy şînê de, li gor hînek serçavîyen agahdariyan, Ecevît dîsa di derbarê doza kurdan de, bi gelek rîexistin, sazgeh û kesên bi xwedîyê nav û gotin derbas re pêyvendî danî û bala wan kişand. Eger iro li Swêdê li dij kurdan rewşike nû û nebaş pêk hatîye û tê, gelo ji wan sedeman yek jî ev pêyvendiyê Ecevît nîne?

Bi rastî, di derbarê pirs û doza kurd

EMERİKA ÇIMA ÊRİŞÎ LİBYA KIR ?

Di 14-ê Nîsanê de 16 balafirên Emerîka yên eskerî, ji balafirgehê li Îngîlistanê firiyan û êrîş birin ser Lîbya. Şev nîvê şevê balafirên eskerî, xelqê lîbî di xew de dane ber bombebaran. Gelo çima?

Gava mirov politîka Emerîka nas bike, ne hewcye bipirse: gelo çima? Pirsên ku di vê warî de mirov ji Emerîka bike, gelein. Gelo çima Emerîka êrîşî Nikaragua dike? Gelo çima Emerîka êrîşî Grenada kir? Gelo çima Emerîka êrîşî Viyêtnam dikir? Gelo pêwîst bû ku Emerîka bomba atomî bavêta ser Hîroshima û Nagasaki?

Ser, di dîroka mirovatiyê de ne tiştekî kesnediye. Dîroka mirovatiyê, ji destpêka xwe heta fro bi ser derbasbûye. Lewra, mirovan bi taybetî di vê sedsalî de rîbazên ser jî danîne pêş xwe, wekî di ser de tenê cî û hêzên eskerî dikarin bibin armanc. Welatên cihanê qedexe kirine, ku xelqê medenî di ser de bibe armanca êrîşen eskerî.

Lê, ma di kîjan êrîşen Emerîka de xelqê medenî nebûye armanc? Gava Emerîka bomba atomî avête ser Japonya? Gava Emerîka 15 mîlyon ton bombe avête ser xelqê Viyêtnamê?... yan jî gava Emerîka di 14-ê Nîsanê de xelqê lîbî di xew de da ber bombebaran?

Polîtîka empêryalîzmê eve: bi zor hukumkirina cihanê. Dema Emerîka ev êrîşa nemirovî bire ser Lîbya, tu deng ji hevalbendê wî li dij vê erîşê hov nehate bihîstin. Ji ber ku Emerîka li piş vê erîşê ne bitenê bû. Serokwezîra Îngîlistanê, Margaret Thacher, îzîn da ku balafirên Emerîka ji belafirgehê İngîlistanê bifirin. Herweha serokê Elmania Helmuth Kohl û serokê Fransa yê "sosyalist" Miterand, êrîşa Emerîka parastin. Ev yeka jî baş nîşan dide, ku sistêma empêryalîzmê êrîşkere, serxwaze, talankere û dijminê mirovatiyeye. Empêryalist, bi vî avayî êrîşen hov dixwazin cihanê têxin bin kontrola xwe, mirovatiyê ji bo armancen xweyê qirêj bikin xulam.

ÇIMA LİBYA ?

Emerîka û Lîbya du welatên ji hev geleki dûrin. Her yek li alîkî cihanêye. Carna du welatên hevsînor, ji ber hin girêkên di nav xwe de êrîşî hev dikin. Û mirov têdigêhe. Lê dema wenatekî din, ku li aliyê dinê cihanêye, bike, wê çaxê divê mirov li ser sedema wê kûr bifikre.

Ji demeke dûr û dirêj ve, bi taybetî pişti ku Reagan bû serokê Emerîka, Qesra Spî bi tehrêن cure-cure êrîş bir ser Lîbya. Li pişti her bûyera terorîstî, serokê Lîbya Qeddaflî nîşan dan. Bi riya weşanên xwe -en bê hed û hidûd-propaganda li dijî Lîbya kirin. Carna bi propagandê wan kena mirovan dihat: wekî Qeddaflî wê bomba atomî li Emerîka biteqîne û hwd. Lê li piş bûyêrê terorîstî kî rawestiye, diyare. Gelek caran serokê CIA bixwe, kirinên xweyî terorîstî iftîraf kirine.

Bêgoman ev propagandê li dij Qeddaflî ne bêsedemin. Serokê Lîb-

ya Qaddaflî eşkare û bi mîranî li dij empêryalîzmê radiweste û piştgiriya têkoşîna gelên bindest dike. Şerê gelên bindest li dijî kolonyalîzm û empêryalîzmê, li gor Reagan û hevalbendê wî "terorizme". Lê êrîşê empêryalîzmê li ser gelên bindest "şerê azadiyê"ye. Gava 15 mîlyon ton bombe li ser gelê Viyêtnam hate barandin, ji bo "azadiya" gelê Viyêt-namê bû !!!

Ji ber vê yekê idara Reagan, bi êrîşa li ser Lîbya, dixwest Qeddaflî bikuje. Bi vî avayî jî wan bawer dikir, ku Qeddaflî bê kuştin, alîkariya ku xelqê lîbî dide têkoşîna gelên bindest, wê bê birîn. Ji aliyê din jî idara Reagan dixwaze, wekî bi riya terorîzma dewletê ya navnetewî, netewên azadîxwaz bitirsîn û bi cihanê ẞidîn zanîn, ku ew dikarin bighê her quncikê cihanê.

Lê dîrokê nîşanê gelên Cihanê daye: dema empêryalîzm qels dibe, êrîşen xwe zêde dike.

QEDDAFLÎ BI SERXWEBÛNA

KURDISTANÊ RE YE

Di 16-ê Adara 1986-an de, duwemîn Civîna Tevgerên Rizgarîxwazên Cihanê bi rîberiya serheng Muemmer Qeddaflî li Tirablis pêkhat. Di vê civînê de nunerên gele hêzên tevgêra rizgarîxwaza Kurdistanê jî besdar bûbûn. Di civînê de, dîsa serokê Lîbya serheng Qeddaflî dengê xwe bilind kir û piştgiriya serxwebûna Kurdistanê kir û got:

"Nunerên gelê kurd jî bi hemû hêzên xwe ve li gel me ne, pêwîste li ser me em li her cî û demî, dengê xwe bilind bikin û piştgiriya gelê Kurd bikin, ew gelê ku welatê wî hatîye perçekirin û di setem û zorîyê de maye. Em bi dil û can piştgiriya gelê Kurd di mafê yekbûn û serxwbûnê de dîkin."

Ji hejî gotinêye ku ev ne cara yekem e, ku pêşeweyê Şoreşa Septembirê serheng Qeddaflî piştgiriya mafê gelê Kurdistanê dike. Serheng Qeddaflî yekemîn serokdewlete, ku di hemû



Serokê Lîbya Muemmer Qeddaflî

cihanê de piştgiriya serxwebûna Kurdistanê dike.

Gelê Kurd jî bi hemû hêzên xwe ve li dijî êrîşa empêryalîzma emerîkî disekine û piştgiriya gelê qehrmanê Lîbya dike.

Bi helkeftina (munasebe) 1-ê Gulanê, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd, bi Partiya Çep - Komünîst re meşya. Meşê ji Maria Torgat destpêkir û li Kungstredgorden kombû. Li

wir, berî ku sekreterê partiyê biaxife, Koma Govend govenda kurdî pêşkêşî civinê kir. Di meşede bi qasî 20.000 kes besdar bûn. Bi vê helkeftinê, Federasyonê ev belavoka jêrîn belavkir.

DEST DI DESTDE EM DERKEVIN 1-Ê GULANÊ

Vaye 1-ê Gulanê, roja karker û xebatkaran, roja piştgiri û hevgirtinê hat. Îsal sed sale, wekî di her roja 1-ê Gulanêde, li hemû welatên cihanê, bi milyonan karker û xebatkar meydanên bajar û gundan tije dikin û bi yek dengî ji bo aşîfî, demokrasî û wekheviyê dengê xwe bilind dikin.


Belê, sedsal li ser vê rojê derbas bûye, lê hê li welatê me Kurdistanê ev roj qedexeye. Li welatê me ne tenê ev roj qedexeye, her ûsa zimanê me, çanda me, stranê me, govendê me... bi kurtî hebûna me qedexeye. Zorkeran welatê me kirine welatê qedexan. Ji bo ku serhildana gelê me bipelixînin, kuştin û lêdan, zîndan û êşkence, bombebarandin bûye jîna gelê me a rojîn. Tu mafêni mirovatiyê li welatê me nemaye. Dijmin gundêni me vala dikin û gelê me bê cû û war dihêlin, welatê me pêşkêşî emperyalîstan dikin.

Ji ber van setemkariyên dijmin em ji welatê xwe dûr ketine û hatine Swêd û welatên din. Lê şerê gelê me ya azadiyê nesekiniye, didomîne û wê heta serfiraziyê jî bido-mîne. Dijmin tucar nikariye vî şerî bide sekinandin.

Îro peşmergeyên qehreman xwîna xwe dirêjînin, gelê meyê mîrxwas bi her avayî fidekariyê berxwe dide û stû-yê xwe li ber dijmin xwar nake. Divê em karker û xwendekarêni niştimanperwer, hêzên welatparêz, demokrat û pêşverû jî dest bidin destê hev û piştgiriya gelê xweyê mîrxwas bikin. Ev roj, roja yekitiyêye, roja hevgirtinêye. Divê em rewşa gelê xwe û welatê xwe bi demokrat û pêşverûyê Swêdre bidin naskirin, piştgiriya wan bistînin. Her ûsa divê em nîşanî dijmin bidin, wekî em dikarin bibin yek. Tenê dijmin ji yekîtiya me ditîrsin. Yekîtiya serfiraziyêye.

**HER BIJÎ 1-Ê GULANÊ!
SLAV LI PÊŞMERGEYÊN QEHREMANI!
HER BIJÎ YEKÎTIYA HÊZÊN KURDISTANÊ!
BIJÎ TEKOŞİNA GELÊ KURD LI HERÇAR BEŞÊN KURDISTANÊ!
HER BIJÎ PIŞTGIRÎ Û HEVGIRTINA KARKER Û XEBATKARÊN CIHANÊ!
HER BIJÎ AŞTİYA CIHANÊ!
BIMRE EMPERYALİZM, KOLONYALİZM Û FAŞİZM!
BIMRIN REJİMÊN KEVNEPEREST Û FAŞİST LI HEMÛ CIHANÊ!
BIMRE MÎLÎTARİZM Û NIJADPERESTÎ!**

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd



Federasyona Komelên Kurdistan Li Swêdê di meşâ I-Ê Gulanêde.



Koma Govendê di civîna 1-Ê Gulanêde dilanên kurdî pêşkêşî 20 hezar kesan kir.

GERA XWENDEVANÊN KURD LI SOVYETÎSTANÊ

Ahmet Cantekin

Hukumeta Swêdê, di sala 1984-an de bîryar da, ku li Zanistgeha Mamos- teyan li Stockholmê, besê kurdî bê sazkin. Berî besê kurdî, yê tîrkan, ereban, finiyan û çend gelên din hebûn. Pişti besê kurdî, hen besên din jî hatin sazkin ji bo biyaniyêن din. Gelo mana sazkinâna besê kurdî li Zanistgeha Mamosteyan ci ye? Manayêن xwe gelek in. Wek qebûl- kirina gelê kurd û zimanê kurdî. Hew, ev qebûlkirina tenê bi serê xwe sîleyek gelek girane, ku li dijminêن gelê kurd dikeve. Ew dijmin ku hem- berî sazkinâna besê kurdî rezîl û rusrar dibin.

Di payiza 1984-an de gelek xwendekar, ku kîmasî lîse qedandibûn, ketin îmtîhana besê kurdî û ji wan neh (9) kes bi ser ketin. Ji wan yek keç û heşt jî xort bûn. Di destûra Zanist- gehê de hatiye nivîsîn, ku ew xwendekar, di termîna sisiyan de sê heftê karin biçin welatê xwe û di çend dibistanan de praktîka mamosiyê bikin. Ji bo me, xwendekarên kurdan, mecal tune bû ku em biçin welatê xwe yê şîrîn û praktîka xwe bikin. Ji bo ku her çar besên welatê me di bin des- têن kolonyalîstan de ne. Ji bo me yek rî mabû, ku em herin Ermenîstanâ Sovyetîstanâ Sosyalîst. Li wira zarokîn kurd di dibistanan de bi zimanê xwe dixwînîn.

Serokêن Zanistgeha Mamosyan li Stokholmê, di destpêkê de razî nebûn, ku em sê heftê praktîka xwe li wira bikin. Em geleki li ber xwe ketin, lê em vala rûnenîstin. Em xebitîn, ji bo ku rastî bi cih bê. Em çar rojan neketin dersan. Me li ser kaxi- zan xwastina xwe nivîsî û pêşkêşî xwendekar, mamosî û gelên ku li Swêdê dijîn, kir. Me gelek alîkarî dît û mafê me jî hat qebûl kirin. Em dê biçin Sovyetîstanê. Em dê di termîna sisiyan de biçûna Sovyetîstanê. Lê ji bo ew tiştîn ku qewimî bûn, cûna me ma termîna çaran, bihara sala 1986-an. Me her tiştîn xwe û berna-

ma xwe tewaw kir. Gera me ji 6-ê Nîsanê destpêdir û 27-ê Nîsanê diqedîya.

BERNAMA GERÊ

1. 6-10-ê Nîsanê - Lenîngrad.
2. 10-12-ê Nîsanê - Baku.
3. 12-15-ê Nîsanê - Tibilis.
4. 15-23-ê Nîsanê - Yerîvan.
5. 23-27-ê Nîsanê - Moskova

Berî her tiştî, divê ez bêjim ku gera me wek me xwast nebû. Dema ku em li Zanistgehê runiştin û me gera xwe plankir, bê goman me şas plankiribû. Me plana xwastina xwe şand hukumeta Sovyetîstanê re, lê hemû xwas- tinê me bi cih nehatin. Eger em xwe- dî tercûbe bûna, me kariba karê xwe baştır bimeşanda. Lê mixabin pir tiş- tîn hêja bi dest me neketin. Meselen, me nikarîbû besê kurdî li Lênîngradê bidîta, wilo jî li Yerîvanê û Mos- kovayê me nedî. Mafê me tûne bû. Destê me de kaxizê musadê tûnebû.

LENÎNGRAD, 6-10-ê Nîsanê

Dema ku em gîhêştin Lenîngradâ xweş, serêvar bû. Xwedîyê me li Sovyetîstanê Întourîst bû. Tercumanê me, ku bi swêdî dipeyivî, bi tev oto- buseka nuh benda me bûn. Em li otê- la Astoriya bi cih kirin. Em di mabû- na 6-10-ê Nîsanê de li gelek cihîn Lenîngradê yên xweş, bi nav û deng gerîyan. Zanebûna me li ser Şoreşa Oktobirê, şerê cihanê yê duduuya û rewşa fro firehtir bû. Me nêzî deh kurdan li Lenîngradê dîtin. Ji van yê herî bi nav û deng Dr. Ordîxanê Celîl bû. Wî gelek tiştîn xweş di derheqa gelê kurd de digotin. Ordîxan, rewşa kurdan ci li Kurdistan û ci li Ewropa, xweş dizanî. Wî digot: "Eger hûn ji kûrd û Kuristan hezdîkin, bibin yek, Kurdistanek azad awakin, bese

beşbûna me, hûn bûne 41 partî û rîexistin".

Pâşê me Dr. Zerê Üsiv jî dît. Ew bi xwe serokatiya besê kurdî dike, di Akademiya Zanistî a Lênîngradê de. Me gelek şîrêtîn hêja ji wê jî wer- girtin.

BAKU, 10-12-ê Nîsanê

Me li Baku çar Kurd tenê dît. Baja- rên, gundêñ ku kurd lê dijîn dûrbûn. Wexta me tunebû, ku em biçin kur- dan bibîn. Ji van çar kurdan yek nivîskar bû. Me bi riya wî hinek tişt li ser kurdîn Azerbaycanê naskir. Lê tenê li Tibilisê û Yerîvanê bi firehî li ser rewşen kurdîn Sovyetîstanê me naskir.

TİBLİS, 12-15-ê Nîsanê

Bajarê Tibilisê bajarekî xweşe. Li wira kurdîn me ciyê xwe girtine. Bi hatina me li balafirgehê pir kes hatin pêsiya me. Wana alîkariyeke zehf bi me re kirin. Li Tibilisê dawet, govend, tiyatroya kurdî me dît. Berî her tiştî, me mîvanperweriya, camêriya kurda dît. Ez dixwazim, pir dixwazim pey- vîn xweş bêjim, lê ez nikarîm rindi- ya wan, başiya wan, şîrîniya wan bi gotinan binivîsim. Her weha ez nikarîm wan ji bîr bikim.

Li dawatê xelk li me civiyan, pirs li ser pîrsê ji me dikirin. Li ser rewşa Kurdistan dipirsin. Wan bi xwe Kurdistan nedîtibûn, lê hêviya wan dîti- na Kurdistanek aza û serbixwe bû. Keç û xortan ji me re digotin: "Bibin yek, da hûn bikarîbin bi serkevin."

Em êvarekê çûn tiyatroya kurdî. Çend besên kurt pêşkêşî me kirin. Ji wan "Siyamendê Silîvî û Xecê" li ser sahnê listin. Dûra jî keçek şanzdeh salî çend kilamîn girînî pêşkêşî me kir.



Xwendevanê kurd li mala Prof. Heciyê Cindi.

Dûra, dûra jî gul û kufîkên kurdan derketin pêşıya me. Kincêng reng bi reng, lîstikêng cure cure... Çepikêng herdu destêng min pir kêmboğûn ji bo wan govandan. Him keç û him jî lawîk kom bi kom dihatin û diçûn. Lawîkekî heft heşt salî lîstikêng Kafkasa pêşkêşî me kir. Dûra jî koma musîkê derket pêşıya me. Heft kes bûn. Her yekî li aletekî musikê dixist. Du xortan jî kilam gotin... Pir xweş gotin, em gelekî kîfîxwâşbûn... Me nedixwest ku şev biqede.

Kurdêng me yên li Tîblîsê, rojekê jî filimek nîv demjimar pêş me kirin. Filîm li ser folklor, kîncûn û adetêng kurdan bû. Film ji hêla rektor Pêrişan û

rejîsorekî gurc hatîbû çêkirin.
Apê Kerîm digot:
*"Lêxin birano lêxin
Roja sor bilinde,
Kurdistana aza
Çi qas xweş û rînde."*

YERÎVAN, 15-23-ê Nîsanê

Em di 15-ê Nîsanê de hatin Hayastan (Ermenîstan). Welatê cîranê me kurdan ji hezar salan virde. Otobusa me berê xwe da çiyayêng Ermenîstanê û hêdî hêdî helkişîya jor. Em hatin jor, çi bibînin, li pêşıya me gola şîrin

û bi nav û deng, Sevan. Em dûra hatin Yerîvanê, paytextê Ermenîstanê Sosyalist. Temûrê Xelîl, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyik û çend kesen din em tenê nehiştin. Em zehf ji wan û yên din razîne. Em têr geriyan li Yerîvanê. Em cûn gundêng Kurda. Me kurdêng ku li bajêr jî li gundan jî dijin dîtin. Ew Xwedî kar û xwedî mal bûn, xwedî zar û zêc bûn. Zikê wan têr bûn. Hêviyek wan hebû, xwastinek wan hebû: yekîşî! Digotin: "Bibin yek, ji bo ku em jî bibin xwedî welat û dewlet".

Em li Yerîvanê cûn rojnameya "Riya Teze" û Radyoya Yerîvanê besê kurdi. Mirovîn ku di wan de kar dikirin, hozan û xwedî senet in.

Radyoya kurdi di pêlweşa navîn de, li ser 347 (ya jî 864) metro têt weşandin. Di pêlweşa kurt de li ser 6012 metro têt weşandin. Zemanê wê bi demjimara Yerîvanê di mabûna 18.00-19.00 û 21.30-22.00 de her roj, ji sala 1955-an û virde têt weşandin.


"Riya Teze" li Yerîvan di xaniye-kî bilind, qatê 12-a da ye. Redaktor Mîroyê Esed e. Redaksiyon ji 15 kesan pêkhatiye. Redaktorê yekem Harutîn Mixirçîyan, yê duduva Hiracî Koçan, ku her du jî Ermenî bûne. Yê sisyan Cerdoyê Gêncô û dû Cerdore, Mîroyê Esed têt ser. "Riya Teze" ji 25.03.1930-î virde, wek rojname ji heftê du caran dertê û tîrajê wê 4500. Ji wan 800 lib ji bo xwendevanê dervayî Ermenîstanê ne.

Di Riya Teze de çar par hene: 1. Jiyana Partiya Komunist. 2. Malhebûna gundî û sanayî. 3. Literetur û senet. 4. Çand û edebiyat

MOSKOVA, 23-27-ê Nîsanê

Moskova mezine. Heşt mîlyona bêtir mirov lê dijin. Yek mîlyonî bêtir mirov têng û diçin Moskova her roj. Em jî ji wan komek biçûk bûn. Em jî geriyan li Moskova. Me jî dît Kreml(dîwar), Muza Lenîn û filîmek -nîv demjimar dirêj- li ser Lenîn. Me li wê kurdêng xwe dîtin. Lî kêm. Ne wek Tîblîs û Yerîvan.

Gotina dawiyê: Me gelek baş wext derbas kir. Yêng ku alîkariya xwe gêhiştiye me, ji wan re zor spas dikin. Gelek spas û silavêng germ li hevalêng ku niha dûrê me ne. □



Dîmenek ji Yerîvanê

ME ŞAIRÊ MEZIN HÊMIN BI BÎRANÎ

Di 18-ê Nîsanê 1986-ade, şairê kurdê mezin, Hêmin, li bajarê Kurdistanê Urmiyê, di 65 saliya xwede serê xwe danî. Bi serfîdanîna şairê nemir, Hêmin, gelê Kurdistanê lawekî xwe-yî hêja winda kir.

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêd, bi munesabeta bîranîna Hêmin, di 31-ê Gulanêde, li bajarê Stokholmê civîneke bîranînê amade kir. Di civînêde nunerên rêxistinê Kurdistanê û ji sedî bêtir kurdên dilsöz besar bûn û ji bo hurmeta Hêmin dequekê rawestan.

Civîn ji aliyê hevalên Huseyîn Seîd û Elî Zerdeş hatê idare kirin. Pişti ku heval Huseyîn Seîd bi axaftineke kurt li ser jiyanâ Hêmin civîn vekir, rê dane Dr. Cemşid Heyderî û şairê kurd Xebat Arif. Dr. Cemşid Heyderî li ser jiyanâ Hêmin, xebata wî ya siyasi û tema ristên wî dûr û dirêj sekînî, malûmaten giranbiha dane mîvanan.

Şairê kurd Xebat Arif jî li ser nasîna xwe û Hêmin axaft û çend ristên Hêmin xwendin.

Dûre dengbêjê kurdê navdar, Nasir Rezazî, behsa bîranînê xwe bi Hêminre kir û marşike Hêmin bi dengê xweyê xweş pêşkêşî mîvanan kir.



Civîna bîranîna Hêmin.

Bi vî avayî dawîya civîna bîranîna Hêmin hat. Nunerên ew rêxistinê Kurdistanê di civînêde besarbûn:

Partiya Democrat A Kurdistanê İranê, Partiya Democratê Kurdên Pêşverû Li Sûriyê-rêxistina Swêd,

Partiya Pêşeng A Karkerê Kurdistanê-komîta Swêd, Komîta Piştirtina Reya Şoreş Li Swêd, Tevgera Têkoşîn, Selîm Keya, nunerê Komîta Rêxistiniya Yekîyiya Sosyalist A Kurdistanê.

CUNTA FAŞİST LI TIRKIYÊ HATE PROTESTO KIRIN

Rêxistinê kurd û tirk ên demokratik di meha Adarê de bi belavokekê cunta faşist li Tirkîyê protesto kirin. Di belavokê de êskîncênu ku li Tirkîyê û Kurdistanê li girtiyen siyasi dibe, hate teşhîr kirin. Tehrî êskîncênu bi şikil ve di belavokê de cih girtî bû. Her weha wan rêxistinana kampan-yeke imze ji vekirin û ji xelkê Swêd, li dijî kirinêna cunta faşist imze kom-

kirin.

Belavoka ku bi zimanê kurdî, tirkî û swêdî belavbibû, daxwazên jêrîn têde hebûn:

- Bila êşkênce û êdam (darvekirin) bisekine.
- Bila ji kesên êşkencetur û berpirsiyaran hesab bê pîrsin.
- Ji girtiyen siyasi re azadî.
- Divê zilma netewî, ya li ser gelê kurd

dawî bê dayin.

-Bila alfakariya leşkerî û aborî ya bi Tirkîyê re dibe bê sekinandin.

Rêxistinê ku ev kara bi hev re kirin ev bûn:

YKDK, KOMKAR-Swêd, DEV-RIMCÎ İŞÇÎ, DİFAB, İSTİB, İŞÇÎ GERÇEGÎ, KKDK, BİRLİK YOLU, GERÇEK Adk, RÊYA ŞOREŞ.

CIVÎNA VPK LI SER KURDA LI BAJARÊ ENKOPINGÊ

Di 18-ê Adarêde Partiya Çep- Komunist (VPK), li bajarê Enkopîngê civînê li ser kurdan pêk anî. Di derbarê civînê de, rojnamevan Eva Grandbeck, di rojnama Enkopîng Postde malumatên jêrîn dide:

—Kurd û swêdî li Bryggargorden, ji bo ku filmê Yilmaz Guney "Re" bibînin, civiyabûn. Xwediye malê VPK bû. Li bajarê Enkopîngê 30 Kurd dijîn. Ewqas kurd jî, wê di demeke nêzîkde bêne vira. Kurdênu ku li Enkopîngê dijîn, ji Kurdistana Iraqêne.

—Li Tirkîyê, Iran, Irak û Suriyê 20 mîlyon kurd, di bin êrişen girande dijîn. Tu welat ji van welatan, Kurdistanê yan kurdan qebûl nakin. Karê navnetewî, ku em ji bo kurdan bikin eve: wekî em behsa zordestiya li ser kurdan belav bikin. Hukumeta Swêd, divê pirsa kurdî di Koma Netawande û li Meclîsa Ewropayê têxe rojêvî, got Oswald Soderqvist, parlementerê VPK di meclîsa Swêdde.



Amadekarê civînê. Ji destê çepê: Şoreş Bladhede, Olle Jonsson, serokê VPK a mintiqâ Enkopîngê, K. Hisyar û Oswald Soderqvist.

—Li Tirkîyê axaftin û nivîsandina kurdî qedexeye. Ger li ser yekî elfaba kurdî derkeve, cezayê wî deh sal

zîndane. Ji xwe gotina "kurd" qede-xeye, got Şoreş Bladhede, pêdagogê malbatê kurd li Uppsalayê.

ŞEVA PIŞTGIRIYA JINÊN KURDISTANÊ



Koma Komelê li ser şanoyê

Komela Jinê Demokratên Kurdistanê Li Swêd, di 29-ê Adara 1986-ade, ŞEVA PIŞTGIRIYA JINÊN KURDISTANÊ çêkir. Nêzîkî 400 kesî di şevêda bêşdar bûn. Dewlemendiya bernema şevê nîşan dida, ku komele ji bo serfiraziya şevê gelek xebitiye. Di şevêde folklor, koro, tiyatro û stranvanêni komelê Kulîk, Zozan, Nesrin hunerên xwe pêşkes kirin. Delal, Birîndar û Azad bi stranên xwe ve piştgirtî kirin. Helbestên xweş hatin xwendin. Axaftin çêbû, ji rewşa Kurdistanê, ji rewşa jinêni dinê, 8-ê Adarê, rewşa jinêni Kurdistanê di dîrokê de û iro, bi kurtaşî hat bahskirin. Ji 16 rêtixistan mesaj hatin. Şeva piştgirtiya jinêni Kurdistanê, nimunekî hêja ji xebata kolektiv a jinêni kurd ên Stockholmê bû. Di dawiya şevê de wan ji bo gavêne pêş de bangî hemû jinêni kurdan kirin:

"Xwîşkno! Roj roja xîretêye, de werin em bibin yek ji bo bidestxistina mafêni xwe, ji bo parastina zarokêni xwe, ji bo wekhevitiya hemû mirovan, ji bo aştiya cihanê û ji bo Kurdistanek azad û serbixwe"

DIBISTANÊN ŞEMIYÊ HATIN GIRTIN



Koma zarokên kurd di govendê de.

Li Swêdê, di sala 1967-an de, ji bo parastin û pêşvebirina ziman û çanda zarokên biyaniyan "Dibistanê Şemî" vebibûn. Sal bi sal hejmara zarokên biyaniyan zêde bûn. Li gelek taxên Stockholmê jî, dibistanê şemiyê dest bi perwerde û hîndekariyê kirin.

Di dawiya sala 1982-an de, li Stockholmê, li taxa Tenstayê beşa

kurdî jî vebû. Di demeke kin de, ji her taxên Stockholmê zarokên kurdan çûn wir. Ji sala 1985-an heta niha sê sinifên beşa kurdî vebûn: 1- sinifa ziman û wêje, 2- sinifa dîrok û cografya, 3- sinifa mûsik û folklorê. Ji bo her sinifekê jî mamosteyek hebû.

Beşa kurdî heta îro gelek xebat kir û hilberîn û berhemên wê jî dît û

berhev kir. Komikên wê yên folklorê û yên stranan gelek caran derketin şev û şahiyêndan kurdan û biyaniyan.

Dem û dem televîzyon, radyo û rojnamayê Swêdê ji xebata wan, bergeh bergeh weşandin. Şagirtên dibistana şemiyê, bi Şivan Perwer ve kaseteke starnêndan kurdî tijî kirin û belavkirin.

Sazgeha dibistana Swêdê, di destpêka 1986-an de, bîr yar da ku dibistanê şemiyê bêñ girtin. Sedemê girtinê jî rewşa aborî nîşan dan. Hezar mixabin di 26-ê Nîsana 1986-ande, dibistanê şemiyê hatin girtin. Di wê rojê de, hemû dibistanê şemiyê, li Stockholmê, li Skansenê bi şahîyeke mezin û dewlemend bîryara girtinê protesto kirin. Her komeke biyânî, di kincêñ xwe yên netewî de, stran û dîlanêñ xwe pêşkêş kirin. Di şahiyêde koma kurdan û japonan gelek bala temaşevanan kişandin. Federasyona me jî, piştgirî û alîkariya beşa kurdî kir. Li dijî bîryara girtina dibistana şemiyê, tevî beşa kurdî belavokek weşand û dê û bavênd kurd vexwande şahiya protesto.


KOMELA ÇANDA KURD LI BOTKYRKA OLOF PALME BÎR ANÎ

Di navbera rojê 4 û 7-ê Adarê de, Komela Çanda Kurd Li Botkyrka di ıstasyona trêne de, li Fittja, defterekê taziye ji bo Olof Palme vekirin.

Endamên Komelê, masa defterâ taziye bi kulîkhan xemîlandibûn û sûretê Olof Palme danibûn ser. Li ser kartonekê jî úsa nivîsibûn:

- Em kuştina serek wezîr Olof Palme protesto dîkin. Ew guleyên ku Olof Palme kuşt, her úsa jî derbek bû li dijî mirovatiyê, azadiyê, aşitiyê û demokrasiyê.

Xelkê wê heremê (nîvê wan biyani ne) alaqeke mezin nîşan dan û bi gelek zimanên cihanê, di defterâ taziye de nîrînên xwe nivîsandin. Roja dawî berpirsiyaren komelê, defterâ taziye teslîmê Partiya Karkerê Sosyal Demokrat kirin.



Masa defterâ taziye Olof Palme.

SEMÎNEREK LI SER DÎROKA ROJNAMEGERIYA KURDÎ

Zinarê Xamo

Di 20-ê Nîsanê de, li bajarê Stokholmê, zimannasê kurd Malmisanij li ser dîroka rojnemageriya kurdî, bi navê "Rojnemageriya Kurdî Li Kurdistana Bakûr û li Tirkiyê, 1908 - 1980" semînerek da. (Komela Yekîtiya Democratên Kurdistan bi vê semînere rabûbû.)

Wek têt zanîn rojnama kurdî ya pêşin Kurdistan e û hejmara wê a yekem di 22-ê Nîsana sala 1898-an de, li Qahîrê derketi bû. Heval Malmisanij semînera xwe wek bîranîna roja derketina rojnama "Kurdistan" pêşkêş kir. Û di nav kurdêni ji Kurdistana Bakur de ew cara yekem bû, ku roja derketina rojnama "Kurdistan" dihat pîroz kirin.

Malmisanij, di semînera xwe de li ser rojnameyên, ku di nabêna salên 1908 û 1970-î de derketi bûn, sekinî. Ji ber ku hemûyên guhdaran, ew rojnameyên ku pişti salên 1970-î derketibûn dizanî bûn, nasdikirin, loma jî li ser dema pişti 1970-î ne hat sekinandin.

Di semînerê de, ne bes li ser rojnameyên ku bi kurdî derketi bûn hat rawestandin. Her wisa li ser ew rojname û kovarên, ku di rûpelên xwe de cî da bûn nivîsên kurdî, yan jî li ser mesela kurdî sekinî bûn jî, hat rawestandin. Di beşa nasandina wan rojname û kovaran de, bi kurtayî ew nivîsên ku di van kovaran de hati bûn weşandin û meselên ku muneqeşe li ser çê bû bûn yek bi yek bi guhdaran hatin nasandin.

Bî van kovar û rojnaman, li ser rojnamenê meheli jî hat sekinandin. Di beşa van rojnaman de jî hat diyarkirin, ku her çiqas van rojnamana ji qerekterê -ruhekî- kurdayetî dûr bin jî, lê belê ji bona têghiştina hin bûyeran wê karibin gelekî bi kér bê. Di vî warfî de jî gelek mînak hat dayin. Ji van mînak yek: Ew 30 rojnamen ku li Diyarbekrê derketi bûn hat bi bîr anîn. Di van rojnaman de nivîsên bi asûrî û ermenî jî hatibûn weşandin. Bi kurtayî hat gotin, ku gelek bûyeren ku hetanî fro em baş pê nizanîn, bi alîkariya van rojnaman dikarin ronî bikin.

Beşekî din jî, ku li ser hat sekinandin, ew kovar û bultenêni ku ji alî şagirtêni unîversitê ve hatibûn derxistin, bûn. Di vî warfî de jî li ser dema di nabêna salên 1955 û 1975-an hat axaftin. Hat gotin, ku van kovarana - yan jî bultenêni dem-demî li Stembol û Enquerê ne bi dûzan, lê bi nabêna hatine weşandin. Û di van weşanan de jî li ser Kurdistanê gelek nûçeyen giring hene.

Cardin di semînerê de li ser tekiliyên di nabêna weşanan û şerê gelê kurd yê netewî û demoçratîk jî hat sekinandin. Di vî beşî de jî hat gotin, ku dema xebat û tekoşîna netewî û demoçratîk xurt bû ye û pêşde çû ye, bi vê xebat û tekoşînê ve girêdayî kovar û rojnamen kurdî jî derketine û di nav gel de hatine belav kirin. Lê belê dema hêzên kolonyalist êrif birine ser gelê me û tekoşîna wî bi darê zorê pelçiqandine, wê demê dengê kovar û rojnamen kurdî jî hatine bîrrin. Bê şik ev yek ji alî hêzên dujmin ve û bi zor hatiye bi cî anîn.

Bî van weşanêni ku me li jor qal kir, li ser weşanêni ilegal - weşanêni bi dizî, bin erd - jî hat sekinandin.

Li gor rêza derketina tarîxa wan, ew kovar û rojnamen ku di semînerê de li ser hat sekinandin, em dê ji wan çend heban li gor girîngiya wan li jêr pêşkêş bikin.

- | | |
|-------|---|
| 1908: | 1- Kurd Teawun ve Terakkî Gazetesi, Stenbol |
| | 2- Şark ve Kurdistan, Stenbol |
| 1909: | Peyman, Diyarbekir |
| 1913: | 1- Rojî Kurd, Stenbol |
| | 2- Yekbûn, Stenbol |
| | 3- Hetawî Kurd, Stenbol |
| 1918: | Jîn (kovar), Stenbol |
| 1919: | 1- Kurdistan, Stenbol |
| | 2- Jîn (rojname), Stenbol |
| 1927: | Agrî, Agrî, (di vî warfî de hin tarîxên cuda têr dayin) |
| 1948: | Dicle Kaynagi- Çavkaniya Dicle- Stenbol |
| 1950: | Şarkin Sesî, Stenbol |
| 1958: | İlerî Yurt, Diyarbekir |
| 1962: | Dicle Fırat, Stenbol |

Di semînerê de, ne bes nav û tarîxên derketina wan kovar û rojnaman

hat dayin, her wisa bi kurtayî be jî li ser naverok, berpirsiyar û nivîskarêni wan jî hat sekinandin, ji hin nivîsan hin beş hat xwendin. Ya din jî, ji hinekan wan fotokopî û ji hinekêni wan jî hejmarê eslî guhdaran re hate nîşan dayin.

Piştî guhdarî kirina semînerê meriv didît ku bi rastî heval Malmisanij û heval M. Lewendî - di destpêka semînerê de Malmisanij got, ku ev xebat ji alî wî Mahmud Lewendî ve hatiye kirin - xebatek çiqas hêja kirine. Dil dixwast, ku di hemû warfî de lêkolînên wa hebûna. Lê em hêvî dikin, ku wê ji fro pê ve gelek xebatêni wisa çêbibin û lêkolînên wisa derkevin holê.

EM BULTENA

"NEWROZ"

PÎROZ DIKIN

Komela Çanda Kurdî Li Botkyrka, dest bi weşandina bultena Komelê, "Newroz"ê kir. Bulten, bi zimanê kurdî û tirkî hatiye weşandin. Di gotara "Destpêka Newrozê de" tê gotin, wekî bulten li ser biryara kongra komelê, wê ji du mehan carekê, bi zimanê tirkî û kurdî bi çar rûpelan biweše. Di bultenê de, wê li ser qewimandinê li Kurdistanê û cihanê xeberên kurt cî bigre. Li ser rewşa multeciyen kurd û kar û barê komelê agahdarî bê dayin. Nivîsarên li ser dirok, edebiyat û zimanê kurdî bête weşandin. "Newroz" wê di çarçova prensibêni kovara Federasyona Komelêni Kurdistanê li Swêd, "Berbang"ê jiyanâ xwe bidomîne, Em "Newroz"ê pîroz dikin û jiyanekê dirêj jêre dixwazin.

WESANÊN NÛ

Xwendevanê hêja,

Bê goman hûn dizanin, ku iro gelê me di çi rewşê da ye û disa bê goman hûn dizanin, ku rewş bûye hoyê hindê ku bi hezara kurd müşextibûne û ji Kurdistanê dûr ketîne. Dibêjin iro hêjmara kurdan li Ewropa, Emerika Bakur, Keneda û Ewistiralya ji nîv mîlyonê derbas dibe. Di nav wan de bi seda ronakbûr, zana û nivîskar hene û ev bûye hoye hindê ku bizavek roşenbîri xurt serê xo hil-daye. Lî ji ber ku me rêxistînek nîne, bikare hemû kurdan di bin baskên xwe da bicivîne, em bi başî rewşa hev nas nakin. Iro bi dehan kovar û pirtûkên kurdî çap dibin,

lê zanyariya me derbarey wan kême. Lewra Berbang pêwîst dibîne, ku rûpelên xwe ji weşanên kurdî re veke û xwendevanê xwe pê agahdar bike. Anglo her kovarek yan pirtûkek hêja bi zimanê kurdî yan bi zimanekê biyanî, lê li ser pirsên kurdî be, em dê zanyariyê li ser, pêşkêşî we bikin. Edî daxwaza me ji weşanxane û nivîskarên kurd ewe, ku weşanên xwe ji "Berbang"ê re bişînin, ji bo ku em bikarin bi avayekî rêk û pêk zanyariyê bidin xwendevanê xwe.

Spas.

AŞITÎ

Dîwanek din, a helbestvanê mezîn Cigerxwîn bi navê AŞITÎ ji aliyê Weşanxana Kuristanê li Stockholmê hate çapkîrin. Bi vê dîwanê, hejmara dîwanê Cigerxwîn ên çapkîri gêhişte heştan.

Ev dîwan ji du pêşgotin û 94 helbestan pêkhatiye. Pêşgotina yekê ji aliyê weşanxanê ve hatiye nivîsandin û ya din, ji aliyê rojnameyanê kurd ê Sovyetî, Temûrê Xelîl Muradov. Helbesten dîwanê li gor babetan hatîne dabeşkirin: beşê welatparêzî û civakî 38 helbest, beşa evîndariyê 50 helbest û beşa sisiyan 6 helbesten cure-cur. Li dawiya dîwanê listeyek ji pirtûkên Cigerxwîn ên çapkîri heye û hejmara wan dîghê 16 pirtûkan.

Ev pirtûkna di navbera salên 1945-1985 li Şam, Beyrut, Bexdad û Stockholmê hatine çapkîrin. Em ji weşanxana Kurdistanê re serfiraziyê dixazin.

Weşanxana Kurdistan.
Gallerstagr. 11-102,
124 48 BANDHAGEN

"ROJA NÛ"

Roja Nû rojnamek heftane bû, di navbera salên 1943-1946-an de, li Beyrutê hatibû weşandin. Xwedî û berpirsiyare "Roja Nû", rojnameyan, nivîskar û zimanzanê bi nav û deng Kamuran Alî Bedirxan bû. Ji vê rojnameyê 73 hejmar derketine bi zimanê kurdî û fransizî. "Roja Nû" di bingehê xwe de rojnameyek siyasî bû ye, lê cihekî fireh ji çand û edebiyata kurdî re terxan kiriye. Her wisa

nivîskarê herî mezîn û navdarên kurd bi xameyên xwe yên zêrîn rûpelên wê xemilandine. Weke Celadet Alî Bedirxan, Cigerxwîn, Qedîrî Can, Osman sebîrî, Hesen Hişyar û geleken din.

Weşanêن Jîna Nû, tev hejmarên "Roja Nû" dayne hev û ji nûve di berhevokê de çapkîrine. Bi vê weşanê, hejmara weşanên Weşanên Jîna Nû dîghên heftan. Em ji Weşanên Jîna Nû re di xizmeta çand û edebiyata kurdî de serfiraziyê dixwazin.

Weşanên Jîna Nû
BOX 24 012
750 24 UPPSALA

"PEYV"

Di Adara 1986-ê, bi dialekta kurmanciya jêrîn (soranî) û bi elfabeya erebî, kwareka nû bi navê "Peyv" derket. Ev kovar, kovareke çandeyî-gîştiye. Ji aliyê melbenda roşenbîriya kurdî li London derdikeye. Kemal Mirawdelli, -nivîskarekî navdare ji Kurdistanâ Başûr- redaktorê kovarêye. Di vê kovarê de nivîsar, vekolîn, helbest û çîrok hene, ji aliyê van nivîskaran ve hatine nivîsin: Kemal Mîrawdelli, Dr. Cemîdî heyderî, Xebat Arif, Hewar, D. K. A., Hawrî, Namo, A. Ş. û Abdurrezaq Mezrîng. Di dawiya kovarê de, destura melbendê heye û ji heft maddeyan pêkhatiye. Ev melbend, melbendek rewşenbîri û civakiye û bi çi hêzîn siyasî ve girêday nîne û armanca wê yekîtiya kurdên İngîlistanê ye. Bi kurî destura wê û ya Federasyona me gelek nêzîkî hevin. Em ji Melbenda

Roşenbîriya Kurdî Li London û kovara "Peyv" re hevkarî û serkefîtin dixwazin.

"SERDEMA NÛ"

"Serdema Nû" yan "Serdemî Nwe", rojnameyek kurdiye, yên ku derdixin, tenê navê "destey nuseran" ango "desteyê nivîskaran" li xwe danine. Di vê rojnameyê de nivîsar bi kurdmancî(bi tîpêñ latînî) û soranî(bi tîpêñ erebî) û bi zimanê farisî hene. Heya niha 3 hejmar derketine. "Serdema Nû" rojnameyek siyasî û çandeya giştîye û ji lô rûpelan pêkhatiye. "Berbang" pîrozbahya xwendevanê kurd bi derketina wê dike û ji "destey nuseran" re serkefîtinê dixwaze.

Li Tirkîyê: Kîjan Demokrat û Demokrasî

Dûmahîka rûpel 9

û Kurdistanê de, dîtin û tewrê Ecevît, sosyal demokratîn tirk û rewşenbîrîn tirk de, guhartînê nû çênebûne. Do çi bû, iro jî ewe. Lî îca çi ye? Berî 1980-î, me li welêt ji bo "parastina demokrasiyê" ci digot û çi kir! Ü çi qas xwe êşand... Gelo iro li welat rewş çawa ye? Di vî warî de guhartîneke nû heye an na? Ji bo "hatîna demokrasiyê" kesen me çi qas hêvî û bawariya xwe bi Ecevît û kurê İsmet İno-nu tînin û tewrê wan çawa ne? Ya herî giring jî ev e!

BÜKA KURDA

Bedirxan Sindî, helbestvanekî gelek bi nav û deng e li Kurdistana Başûr. Sala 1943-ê, li bajarê Zaxo hatiye dinyayê. Sala 1966-a beşê pîskologî li Zanistgeha Bexda xwendiyê. Sala 1970-î li bajarê Dihokê du hejmarên kovarekê bi navê "Çiya" derxistiye. Sala 1979-a doktora xwe li Îngîlîstanê li ser pîskologiya zarakan wergirtiye. Helbestên wî gelek li Kurdistanê belav bûne û gelek ji helbestên wî bûne stran û dengbêjên navdarên Kurdistanê, wekî Tahsin Taha, Gulbihar, Bişar Zaxolî û hwd. gotine. Ji bilî helbestan,

gelek gotar û vekolînên edebî li rojname û kovarên Kurdistanê û Êraqê, bi kurdî û erebî belav kirine. Helbesta wî "Bûka Kurda" ya ku li sala 1969-ê hatiye nivisîn, ji aliyê Tahsin Taha bûye stran û zû li nav xelkê me belav bû. Her wesa careka din ji aliyê dengbêjê kurd Mihemed Şêxo bi awazekî din bû stran û dîsa gelê me jê hezkir. Lewra em vê helbesta ciwan û bilind, bi deqê (tekst) wê yê temam pêşkeşî xwendevanên "Berbang"ê dikin.

M. Kardo

"Pêşkêş bit bo bizava Şerîf Paşay, yê ku xaznama miletê Kurd pêşkêşî Civata Miletan kirî piştî bi dûmahî hatina Şerê Cihanî yê êkê."

Ey felek bo te dinalim bo çi nêrgiz çirmisîn
Ew çîma bextê me hoye her bê dost û bêkesin
Qet dê hêt ew roja me divêt kehniya warî bizêt
Jê vexuyn destâ bîhelînin jê vexuyn çend me bîvêt
Agirê sar û vemirî çav me lê ye geş bibit
Ew bihar têhnê kuştî hîvîdarim xoş bibit
Kordino rabin bîbînin berxekê jar û zeîf
Dane ber pal û kêşana xencerek dijwar li dwîv
Ew werisê tê alandî her ji hîrya berxiye
Pê dikêşin serbirînê bi wî werisê nuxiye
Mezina ji mîje ya gotî dijminê serê xoye kew
Dar bi darî têt bîrrînê destkê bîvrî darelew
Nê me nalîne ji bîvrî sed hîzar cara hewar
Em bi wî bîvrî ketine hind nesax û birîndar
Nê me nalîne ji mîje bo hetavek ruhn û geş
Dawetî rabin semayê bîç biken berperêt reş
Evro kanê li min wê rojê pir ji xoşî û renge reng
Vebguhêzin bûka kurda ew torîna şox û şeng
Kanê kew bo çi naxwînin kanê warê gul gulî
Lê dicêrînin gurg û rovî boşe lê mar û ku'lî
Kanê mîzgefta me tê de sed nîvê rojê kirin
Kanê dargûza tê da şîn gûzeter me jê kirin
Kanê rûbarê pir bizav kanê pêlêt hîviyê
Kanê bêrî ka şivan geş bikin kordîniye
Ka gelavêja me dîtî wextekê zêrîn bijar
Lew megotî hinde êdî her dê minit ew bihar

Baxçeyê vîna nemayî kê we kir kavil bibit
Torîna bextê me evro kê we kir zîz û sil bibit
Evro kanê li min wê rojê pir ji xoşî û renge reng
Vebguhêzin buka kurda ew torîna şox û şeng
Da bibînim keç û lawan mil bi mil bêne sahiye
Bîjkînim kul û eşâ li ber hetava sahiye
Da bîhelînim ji kurda ala li ser çiyayêt pir ji xwîn
Da hawar kim ji dilê sotî herbijt serbest û jîn
Ne gunhe û ne şerme ger me jî ala hebit
Ne omêdek kûr û dûre bawerî bi sala hebit
Dê ji kuloxêt wa şahîda stûnekê dirêj vedim
Pê vekim alayê Kurda da bigehit tava germ
Bêjme xelkê vê cihanê navê kurda jî heye
Kî dê şêt navê me têkdit hindî ku rîber heye
Evro kanê li min wê rojê pir jî xoşî û renge reng
Vebguhêzin bûka kurda ew torîna şox û şeng
Bigirnijînim beçkeşeran ew helal û ew rihan
Piz û zarokêt şehîda ew ku'lîkêt çi nezan
Bêne hêzkê li nav çinaran xefk û davêt xo veden
Kêl û vêla biçiklînin bêjne êk du xo veden
Bêjne şalûl û tivîrka werne hêlinêt berê
Werne sergulp û çeqêt xo bixwînin vê berperê
Berpera jîna me ya nû ew jiyanâ dûr ji jan
Dûr ji saliskî û rûmetî serfirazî bo şîyan
Kotîno dadin ji dadê bo xudê dadê ne ken
Ehrîmen evroke pîç bû sed tilîlî bo veden.

Bedirxan Sindî

GELÎ ZAROKÊN HÊJA,

Redaksiyona "Berbang"ê biryar stand, ku ji vê hejmarê pêve, rûpelekê-duduya bi zarawayên kurdmancî û soranî bide xwendewanên xwe yên biçûk. Hûn dikarin çîrok, helbest, nivîsar û wêneyên xwe ji me re birêkin. Emê tiştên ku hûn bişînin, di quncikê zarakan de belav bikin. Herçî xwendina çîrokêni me, wê gelekî baş be, eger we ji dê û bavê

xwe re bixwendana. De bila zaroktiya wan jî bê bîra wan! Ma ne wiloye? Bi nivîsandinê we Berbang têt xemilandin. Ji bo vê hejmarê me ji we re çîroka "Bilûra Sihri", ya nivîskarê sovyetî Sergey Korîpanov, "bi hêsan kirinê" wergerande zimanê me. Em hêvî dikan, ku di hejmara din de emê tiştên ku hûn ji me re bişînin, biweşînin.

BILÛRA SIHRÎ

Nivîskar: Sergey Korîpanov

Werger : Bavê Nazê

Hebû tûnebû, şivanek hebû. Tevî ku ew feqîr bû, lê her bextiyar bû. Bextiyariya wî jî ji hezkirina şivantiyê û lêxistina bilûrê bû. Wî wilô li bilûrê dixist, dihişt ku kerî xwe ji bîr bike û neçêre, lewra xwe bi govendê winda dikir. Bi pêz re asîman û çûkan dîlan dikirin. Heya rokê jî xwe ji bîr dikir û zû nedîcû ava. Ji bo wilô roj dirêjtir û geşter dibû. Bi vê hostayatiyê şivano li bilûra xwe dixist.

Rojekê ji rojan şivano li kalekî rast hat. Diyar bû ku kalê rêuji dereke dûr hatibû. Loma jî ew ji meşa rê westiyabû. Ji bo ku piçekê kalo bîhna xwe berde, li ba şivên runişt. Şivano nanek ji turkê xwe derxist û kodikek şîr danî ber mîvanê xwe. Da ku dilê kalo xwes bike, şivano rahişt bilûra xwe û lêxist. Dema şivano li bilûrê xist, hemû tişt li dora wî mîna pelên daran reelîn û bû xum-xuma govendê. Kalo bi xwe jî, xwe negirt û ew jî kete dîlanê. Gava şivano nema li bilûrê xist, Kalo jê re got:

—Kurê min, ji xwe re nas bike, bilûra te sihriye. Eger tu lêxînî, tu ci bixwazî, wê daxaza te bi cî bê. Lê belê, divê tu bilûrê bizvirînî aliyê din û lêxînî.

Kalo bi van gotinan beta weta bû.

Şivano bi awakî ecebmayî ji xwe re got:

—Wey ev ci kalekî xerîb bû. Dibe kû bi rastî jî bilûra min sihri be. De kanî ez ê lêxînim, weku wî ji min re got.

Wî bilûr zivirand alîyê din û jê re got:

—Wa bilûrê, de ka min bibe bazarê. Ez dixwazim dîkê sekirî yê bi darik bikirim.

Bi gotina xwe re şivano pif bilûrê kir. Şivano xwe dît nedît xwe li bazarê dît. Ji xwe re dîkê sekirî yê bi darik kirî. Ew dialast û di nav bazarê de digeriya û çarçav li hawîr dora xwe dinêri. Ji



nîşkave awirêñ wî li solek rengo-rengo ket. Sol jî li dikana bazirganekî dewlemend bû. Dilê şivano bijiyayê û di nava xwe de got:

—Wê çi baş ba, eger solek min weha heba! Çaroxêñ min ji hev ketine û nema şivantî bi wan dibe.

Wî nêzîkayî li bazirgan kir û jê xwast, ku solê nîşanî wî bide. Bazirgan şivano derkir û jê re got:

—Ev sol ne ya nigê te ye. Tenê maqul, beq û mîr karin wê têxin nigên xwe. Şivanoji gotinêñ bazirgan xeyidi, bilûr ji paşa xwe derxist, ew zivirand aliyê din û got:

—Wa bilûrê! Ez naxwazim şivan bim, ez dixwazim mîr bim!

Şivano bi gotina xwe pif bilûrê kir û bi girtin û vekirna çavan xeftaneñ mîran lê hate kîrin. Sola rengo-rengo kete nigên wî. Li hawîrdor xulam û xizmetkarêñ wî li ber sekinibûn. Li her alîkî milêñ wî wezîrek rawestiyabû. Çi kesê li bazarê bû, xwe li ber wî avêtibû ser kabokan. Mirovê bazirgan ji xezaba mîr dilerizî.

Şivano bi qerf bi bazirgan keniya. Li paytona zérîñi siwar bû û berê xwe da qesrê. Ji wê demê pêve şivano wek mîra jiya. Şevez nedîçû bê ku kêfa xwe neke. Roj jî nedîçû bê ku neçe nêçîrê. Bi vî hawayî mehek derbas bû... Du meh derbas bûn... Ü yek din jî. Şivano ji rewşa xwe aciz bû. Wî di ber xwe de got:

—De kanî ez ji xwe re li bilûrêxînim!

Bi axaftina xwe şivano bilûra xwe ji paşa xwe derxist û stranek govendê pêlêxist. Wezîr destê rastê xwe avêt mîrê xwe û got:

—Ev bilûra ha ya şivana ye. Ew ne li gor meqamê te ye, mîrê min. Ev karê dengbêjaye, ku bistrêñ, li bilûran xînin. Lê karê te, ewe ku tu fermaña bidî. Eger mîrîn memleketêñ din bibihîzin, ku mîrê me li bilûrê dixe, wê henek û qerfîn xwe bi me bikin. Bi vî tiştî, wê kîmasîyek mezin bê ser te û me.

Şivano bi van gotinan li ber xwe ket û bilûra xwe veşart. Paşı wî ji xwe re got:

—Dêmek wiha, eger ez li bilûrê xim, wê ne li gora meqamê min be!

Di jiyana şivano de roj bi dû rojan de dicûn. Hemû wek hev bûn. Ji bê karî û acizbûnê şivano nexweş ket. Ji dawiya dinê textor jêre anîn. Lê bê fêde bûn. Kesî ji wan nexwaşıya wî nasnekir. Rewşa şivano ne xweşbû. Ew çû bû ber mirinê. Ji nîşkeva bilûra wî hate bîrê. Wî ji xwe re got:

—De ka ez jê bipirsim, belkî ewê nexweşiya min rehet bike!

Lê şivano çiqasî kir û ne kir, ku bilûr wî rehet bike, bilûrê ew rehet nekir. Loma ew xeyîdî û bilûra xwe avêt erdê. Hindik ma bû wê bişkîne, lê wî bilûra xwe neşikenand, lewra kalo bi bîra

wî hat. Di ciyê cî de şivano ji xizmetkarêñ xwe xwest, ku kalo li ser erdê, li bin erdê jê re bînin. Peyayêñ wî yek nekirin didu û kalo anîn ber destê mîrê xwe yê şivan.

Dema şivano, kalo li ber xwe dît, jê pirsî:

—Kalo, ji min re bêje, çîma sîhîr ji bilûra min cû ye?

Kalo jî jê pirsî:

—Ma te ji kengî ve li bilûra xwe ne xistiye?

—Ma ezê çilo li bilûrê xim, ez mîrim! Ev karê ha, karê dengbêjaye... Karê min jî ewe, ku ez fermaña bidim. Eger hat û mîrîn memleketêñ din bi bilûra minbihîsin, ezê bibim henekê devêñ wan.

Kalo lê vegerand:

—Bilûra te sîhîr bû, ji ber ku te xweşik lê dixist. Ewê dîsa bibe sîhîr, eger tu stranekê bi dil û can pêlêxî.

Kalo wiha got û ji ber çavan winda bû.

Şivano nedixast bimire. Tu rê li ber nema ji lêxistina bilûrê pêve. Wî rahişt bilûrê, pîskirê. Lê belê deng jê nehat. Lê gava şivano mîrîtiya xwe ji bîr kir û şivantîya wî bi bîr hat, bilûrê bi avayê berê deng da. Li ber bilûrê, çi kesen li qesrê hebûn dest bi dîlanê kîrin. Pêre pêre nexweşîya şivano çû. Wî, xwe ji nû ve li çolê, di nav kerîye pezê xwe de dît. Li dora wî roj, asîman û pez li ser gîhayê şîn xwe çindîkî li erdê dixistin. Dibêjin heyâ niha şivano li bilûra xwe dixe û rûyê xelkê ges dike. □



Berbang û 88 saliya Rojnamegeriya Kurdî

Dûmahîka rûpel 3

Weke hûn bi xwe jî dizanîn her kovarek hebe bi xwendevanêñ xwe pêşde diçê, di vî warî de em alîkariya we dixwazin, em alîkarî ji nîvîskar û ronakbîrêñ kurd dixwazin, em alîkarî ji dezgehêñ çandeyî yên kurdfî dixwazin, em alîkarî ji partî û rêxistinêñ Kurdistanê dixwazin û bila hûn hemû li wê baweriyê bin ku rûpelên "Berbang" ê ji her kurdekkî welatparêz, demoqrat, pêşverû re vekirîne besdariyê têde bike bi rexne û pêşniyarêñ xwe. Bi nîvîsaren xwe û daxwaza me ya herî mezin xizmeta ziman, çand û edebiyata kurdfî ye.

Em bi helkeftina 88 saliya rojnamegeriya kurdfî pîrozdarîya xwendevanêñ xwe dikin û silavêñ xwe yên germ pêşkêşî giyanê nemirê pêşewayê, karwanê rojnamegeriya kurdfî M. M. Bedirxan û hevalêñ wî dikin. Ji bo ku em wefadarbin ji raberêñ xwe yên pêşîn re, bila rojname û kovarek kurdfî pirbin û bi pirbûna xwe di form û nave-roka xwe de bilind bin.

روون کردنەوەی شەو

چى جوانترە لە زەردەخەنەی سەر لىيۇت !
 چى جوانترە لە پەخشانى زولۇقى ئالۇز و پەشىۋەت !
 چى جوانترە لە بىرىسىكى چاواي كال و لە هەتاوى قىزى زەردەت !
 چى جوانترە لە خۇنچەيەي لەناودەلتا، دەمى بۇ ماچى لىيۇي خۇر كردىتەوە !
 ج بايمەكە، لە شەۋىكى وەها ساردا دېت و با لا ئالۇتۇنى يە كەت پائەزەنلى !
 ج خۇرپىكە، لەناو كىانتا ھەلھاتوھ و وا خەرىكە سەريشت دائىھەگىرسىنلى !
 خۇنچەي ج گۈلىكى ئالە و لەچاوتا چرۇ ئەكە !
 كەرەمناسەي خەلک نەبىت !

تۆئەزانى جوانترىن شت لە هەناسەي ئاگراوى خەلک دايىھ ؟
 تۆئەزانى جوانى كە ئەكاتە لوتكەش، لەسەنگى خەلک تىپەرنابى ،
 دەست لە هەناسە بەرپادا ؟ ئەمەنلى يە هەناسەي كىانى ئەم خەلکە، ھەممو شەۋى ،
 قىدىلە ماجىكى زىندۇو، ئەكە بەناو قىزى شەمۇدا .
 ئەي تۆكۈرپىھى كام هەناسەو كام ئازارى ؟

تۆ بەهەناسە دەرەونىكى بەرفراوان سەوزبۈويت و سەوز ئەبىت .
 بۇيە رەكت لەناو جەركەي ئەم خاڭەدا داڭوتاوه - خانى دىلم - .
 تۆپەرەي ڇاڭاواي ناو دلە بى ئارام و ڇانگرتۇوه كەي سنگى منى .
 تۆ لە ئاينى گەردوون دا جوان ئەنۋىنى و
 لە دلى منىشا سەوزىت .

بۇيە ئەتوانم لەبەر ئاسمانى جوانىتى او لەكلىپەي تەنبا ماجىكتا بىسوتىم و
 هەتا مىردن، دەست لەرەوتى دىلم بەرددەم . دە پىيمەلى :-
 ئەمەنلى بەم رىگايىمدا بىرۇا، ئەمەنلى بەم هەناسەيمدا بىرۇا ،
 ئەشى دلى گەورە بىت و بال لە ئاسمانى جوانىبا بىكەتەوە ؟
 ئەشى مەرقۇپىكى مردوو بەبای هەناسەيەكى خەلکى شىن بىتەوە ؟
 ئەي بۇ لەھەتى شەو ھەمەيە، بەناو دەرياي ئەم هەناسەيمدا ئەھروات و
 ھەر تارىكە ئەي بۇ لەھەتى شەو ھەمەيە ، بەم هەناسەيەدە ئەھروات و
 ھەر بى دەنگە ؟ بۇ سنگى خۇي ھەل نادىرى ؟
 + ئەمەنلى كە جوانى شەو لەسەنورى بالە رەش داگەرپاوه كانى تى پەرنابى ،
 با پەرەي دلە زىندۇوه كان ھەل داتەوە و
 تىپ ماجى شەوى روون بکات .

سەر ووتار

بىرىياپدان لەسەر ئامادە كىردى بەشىك لەم گۇۋقارە - بەربانگ - بۇ ئەنوسىن و بلاڭكراوانە كە بە شىّوە زمانى كىرمانچى خواروو نوسراون و ئەنسۇرسىن ، رووېيەكى ترى بەرەو پېشەوە چۈون و بەربلاڭتىركىردى ئەم گۇۋقارە يە، ئاوه لاڭردى دەرگايىھەكى تىرە بە رووى ئەنوسىن و ھەول دانانەدا كە بەممەستى زىاتر لەمەكتەزىك خستانەوە ئاللۇگۇرپى كىردن و سودلى وەرگرتىنى تەواوى شىّوەكانى زمانى كوردى دراون و ئەدرىن .

بىرىياپىكى واو لمبارىكا كە ئەم ئەركى نزىك خستانەوە و سودلى وەرگرتىن و ئاشۇگۇرپى كىردى، پۇيويستى بە ھەولدانىكى لمبارىتر و زەمینەيەكى بەرفراوان تىر ھەيەو دىارە بە چاڭەش بۇ زمان و نوسىتى كوردى ئەگەرپىشەوە و دەبىتە زەمینەيەك بۇ بىر و را گۇرپىنەوە و لىدوان لەسەر كىرۇگىر فەتكانى بەجى ھىناسى ئەم شەركە و زىاتر لېكۈللىنەوە لىرى و لە ھەمان كاتا ھاندانىكىشە بۇ كۆكرا دنەوە و بلاڭكىردىنەوە ئەنوسىنائە بۇ ئەم مەبەستە ئەنوسىرسىن .

ئىتىر ئەنوسىنائە ج لېكۈللىنەوە لە زمان و پىزمانى كوردى بىن، ج نوسىن بىن سەبارەت بە مىزۇوي زمانى كوردى و پەرەسەندىنى، ج ھەنر نوسىنەكى تىر بىن كە پەرەسەندىن و بەرەوبېشەوە بەردى زمانى ئەددەبى يەكگەرتۈمى تىيا رەقاو كرابىت، ھەر لە شىعر و چىرۇك و وەرگىرپانەوە، تا ھەنر لېكۈللىنەوە يەكى زانىيارى تىر لە ھەر بوارىكدا و لەسەر ھەر باپەتكە، دەبنە مايمە چاڭتىركىردى گۇۋقارە كەو بەرەو پېشەوە بەردى .

ھەر بۇيە گۇۋقارە كە ئاوه لايە سەرپۇوي ھەنر نوسىنەك داكە دەيگاتى، بى گوئىدانە ھەر كوسپىكى رېگر و بەربەستىكى دانراو و دىيارى كراو .

چاوهرى بەرھەم و نوسىنە ئەددەبى و
زانىيارىيەكانتانىن .

UTGIVAR KORSBAND

BERBANG

BOX 45205, 104 30 Stockholm

B FÖRENINGSBREV

